

## Gefên li dijî yekîtiya gelan

Siyaseta dewleta tirk a li Sûriyeyê bi tamamî li ser dijberiya kurdan hatiye avakirin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di çarçoveya vê armancê de di nav şerekî taybet de ye. Lê di rastiyê de armanc ew e ku kurdan ji axa wan derxîne... ***Felemez Ulug/R.6***



## Jin ji vê qonaxê re pêşengiyê dikin

Di serdema şerê rizgariyê yê neteweyî de jin bi tevahî hêza xwe beşdarî nav refên têkoşîna azadiyê bûn. Di pêşengiya wan de, xwerêvebirin bû mînaka îlhamê ya afirîneriya jiyanê. Hatina jinan a nav refên şoreşê û meşa wan a azadiyê,... ***Adar Gulan/R.2***



## Têkiliya muzîk û wêjeyê

Muzîk û wêje du rêzkarên (disîplînên) hunerî yên bingehîn in ku di tevahiya dîroka mirovahiyê de hem ji hev der dibin, hem hevdu temam dikin û hem jî li ser bingeha heman çandê dibin yek. Herdu hêman jî li ser veguhastina hestan, hilberîna... ***Adar Jiyan/R.5***


*15 - 21 Kanûn 2025*
*Hejmar:* 313
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


## Civaka kurd dilsozê nirxên xwe ye

Di roja me ya îro de yek ji mijarên ku herî zêde tê bilêvkirin rizîna civakî, pûçbûna têkiliyan û li dijî vê rewşê girîngiya avakirina civaka exlaqî û polîtîk e. Şerê taybet û qirêjî civak ji hev de xistiye. Bûye ku civak û malbat weke cinawiran zarok û ciwanên xwe dixwin! Di van salên dawî de li bakurê Kurdistanê jî di encama şerê qirêj de ev karên kirêt zêde bûne. Bazirganên van qirêjiyan êrişî hemû nirxan dikin. Li dijî vê jî heke bi serwextî û zanebûn têkoşînek neyê meşandin li ser navê paşerojê wê ji civaka me re jî tiştek nemîne; ne xeyal û ne jî armancek. Em xwe reşbîn nekin. Em bizanin ku ev rewş li çar aliyê cîhanê kêm zêde weke hev... ***Ramazan Olçen/R.7***

## Çerçoveya dîrokî ya şer

Hewldana fêmkirina dîroka şer bi analîzkirina hêzên leşkerî yan jî pêşbirka aboriyê, nepêkan e. Koka şer bi avahiyên wekî dewlet, çîn û milkkirinê tenê nayê fêmkirin; ji ber ku ev hemû encamên şêweya serdestiyê ya kûrtir in. Ev serdestî bingeha xwe ji êrişên mêran ên li ser jin, xweza û çanda jiyana hevpar digire. Hişmendiya mêrperest her ku êrişên xwe kûrtir kiriye serdestiya xwe jî di nav civakê de pêştir xistiye. Li gor vegotinên hevpar ên ku heta niha hatine qebûlkirin, şer ji ber hilberîna zêde ya çandiniyê, pevçûnên ji ber milkkirinê, avakirina çînan derketine. Lê di esasê xwe de şer ji ber êrişên li ser zayenda jin û hilberîna wê derketiye holê. Dewlet û desthilatdariyên ku... ***Medya Bal/R.2***

## Naskirina îradeya aştiyê

Di demekê de ku hewl tê dayîn Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk derbasî merhaleya duyemîn bibe, li Stenbolê konferanseke girîng pêk hat. Konferansa ku ji aliyê Partiya DEMê ve hate organîzekirin malovaniya gelek kesên navdar ên cîhanê kir. Ji Afrîkaya Başûr heya Îrlandayê, ji Meksîkayê heya Îspanyayê bi dehan akademîsyen, filozof, siyasetmedar, parêzer, aktîvîstên aştiyê, xwediyên Xelata Aştî ya Nobelê tevlî konferansê bûn. Herwiha gelek kesên ku nekarîn bi fizîkî tevlî konferansê bibin jî bi rêya teknîkê bi peyamên bidîmen şandin. Peyamên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Figen Yuksekdag û Selahattin Demîrtaş... ***Zinar Ronî/R.6***

# Licê de şero taybet

Licê de serranê peyênan de, tayê polîtîkayê bixetereyî yenê rayîrberdene. Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan bala anceno ser ke kapîtalîzm beden û ruhê merdiman keno meta û roşeno. Ocalan vano ke fuhuş tenya rotişê bedenî nîyo; "Fuhuşo tewr gird, o yo ke merdim rûmetê xo biroşo."




Ewro Licê de, kuçe û kolanan de, heta mîyanê dibistanan de vilabîyayîşê maddeyanê hişberîyan tesaduf nîyo. Sîstemo hukimdar, cayê ke tede hîşê sîyasî û neteweyî xurt o, uca de wazeno ke ciwanan nê hîşî ra dûrî bifîno. Seba nê armancî zî, çeko tewr tesîrin maddeyê hişberî û fuhuş o. Bi nê her di silgiran, wazenê ke ciwanê kurdî nasname, kultur xo û doza xo ya azadîye ra dûr bifinê û bibê koleyê sîstemî.

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan çareserîye "Komelo ehlaqî û polîtîk" de vîneno. Ciwanê Licê ganî nê kayanê lêminan bivînê. Abdullah Ocalan vano ke "Sîlaho tewr gird zanayîş û hîşmendî yo." Ganî keyeyî, şaredarîyî û dezgehê sîvîlî ciwanan perwerde bikerê û înan nê dameyan (tuzaxan) ra bipawê.

Komel ganî vera maddeyanê hişberîyan û kesê ke fuhuşî teşwîq kenê, bertekê xo bimojno. No, parçeyêkê "Xopawitişê cewherî" yo. Xopawitiş tenya bi çek nêbeno; pawitişê kultur û ehlaqê xo zî xopawitiş o. Vera ciwîyayîşê modernîteya kapîtalîste ke merdiman keno sey robotan û gêj keno, ganî alternatîfê "ciwîyayîşê azadî" bêro awan kerdene.

Çîyê ke ewro Licê de qewimîyenê, cîya-cîya nîyê. Licê, seba ke merkezê xoverdayîşî yo, bi zanebiyayîş yeno hedef kerdene... ***R.9***



## Feraset nehat guhertin

Di 8ê kanûna 2024an de, HTŞ ket Şamê û dagir kir. Di serweriya HTŞê ya salek borî de 8 hezar û 500 mirov hatin kuştin. 10ê Adarê HSD û HTŞê ji bo Sûriyeyeke demokratîk peymana tifaqê îmze kir. Lê HTŞ şertên peymanê bi cih nayne. Hevseroka Meclisa Dîplomasiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Nûrşan Hisên diyar kir ku di salekê de siyaseta Şamê nehatiye guhertin û got: "Dest guherî, lê siyaset neguherî." ***R.3***

## 'Divê dewlet gavên wêrek biavêje'

Hevserokê Giştî OHDê Serhat Çakmak der barê mafê hêviyê û biryara DMME de got: "Biryara DMMEyê ya li ser mafê hêviyê ya ji bo Abdullah Ocalan mafek e ku divê bi awayekî yasayî were bicihanîn. Ev biryarek e ku li gorî xala 90î ya makezagonê divê were bicihanîn. Nebicihanîna vê biryarê wek binpêkirina makezagonê ye."



Serhat Çarmak got: "Komîteya Wezîran a KEyê di îlon de got ku divê ev biryar were bicihanîn. Herwiha teqez kir ku divê komîsyona ku li parlementoyê hatiye damezrandin, ji bo vê yekê amadekariyan bike. Ji ber ku meqam û rola wî ya di pêvajoyê de li ber çavan tê girtin, pir girîng e ku mafê hêviyê ji bo birêz Ocalan jî were sepandin. Guhertinek di qanûna înfazê de ji bo vê yekê... ***Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4***

## Xebatên li dijî asîmîlasyonê

Platforma Mûzîkê ya Bajêr a Wanê yek ji xalên wê yên bingehîn jî tevger û berxwedana li hember asîmîlasyona bêeman bû ku çawa li ser her şaneya civakê hat/tê meşandin, bi heman awayî li ser stranên kurdî jî didome. Ji ber wê jî hem komên di çerçoveya mihrîcanê de hatî avakirin hem jî tevahiya atolyeyên xwe de hewl dide kar û xebatên xwe... ***Bêrîvan Kayî/R.11***

## Ezberên tirkan, hestên kurdan

Encama polîtîkayeke dehsalan a 'Li dîwar binêre, li dîmenê nenêre' ye. Nexşe, pirtûk, televîzyon, dibistan, bîranînên xizmeta leşkerî, henek û mîzah... ev hemû di çavên tirkan de, kurd di çarçoveyek teng de dorpêç kirin. Bi vî awayî, wêneyê jêrîn derket holê: kurd neçar man ku her tiştî li ser tirkan fêr bibin. Tirk bêyî ku hema hema... ***Prof. Dr. Abdulillah Polat/R.8***

Medya Bal

# Çerçoveya dîrokî ya şer



Şerê ku bi hişmediya 'kujerê kastîk' dest pê kiriye, ji şerê Jebel Sahaba heta Rojava û Xezayê heman tiştî kiriye hedef. Ev şer di rêbazên xwe de her çiqas guherînan pêk anîbe jî armanca wî tunekirina jiyana hevpar e

Hewldana fêmkirina dîroka şer bi analîzkirina hêzên leşkerî yan jî pêşbirka aboriyê, nepêkan e. Koka şer bi avahiyên wekî dewlet, çîn û milkkirinê tenê nayê fêmkirin; ji ber ku ev hemû encamên şêweya serdestiyê ya kûrtir in. Ev serdestî bingeha xwe ji êrişên mêran ên li ser jin, xweza û çanda jiyana hevpar digire. Hişmendiya mêrperest her ku êrişên xwe kûrtir kiriye serdestiya xwe jî di nav civakê de pêştir xistiye.

Li gor vegotinên hevpar ên ku heta niha hatine qebûlkirin, şer ji ber hilberîna zêde ya çandiniyê, pevçûnên ji ber milkkirinê, avakirina çînan derketine. Lê di esasê xwe de şer ji ber êrişên li ser zayenda jin û hilberîna wê derketiye holê.

Dewlet û desthilatdariyên ku ji vê hişmediyê peyda bûne, hewldana împaratoriyan a berfirehbûnê û modernîteya kapîtalîst jî her ku çûne şerê heyî kûrtir kiriye.

Li gor lêkolîneran di serdema neolîtîkê de di nav civakên ku jin lê serwer bûn jiyan hevpar, berhemdar û kolektîf bû. Yekemîn şêweya rêxistinkirî ya tundiya mêran ev cîhan bi awayekî pergalî hedef girt. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan vê pêvajoyê û hişmendiya ku bi pêş ketiye wek 'kujerê kastîk' pênase dike. Kujerê kastîk bi îradeya jinan re xweza û jiyana hevpar a civakê tê hatiye tunekirin.

Hişmendiya mêrperest a ku li dijî jinan bi ser ket, ji bo serdestiya civakê hêz bi dest xist. Bi vê pêvajoyê re bajar-dewletên yekemîn derket holê. Hewldana parastina van bajaran û berjewendiyên heyî şer kir xalek jêveneger. Li gor dîroka ku heta niha hatiye qebûlkirin her çiqas ev wek 'şerên dewletan' were pênasekirin jî em dizanin ku ev şer ji ber têkbirina rêvebirina jinan a di nav civakê de ye.

**Şerê yekem**

Pevçûna li Jebel Sahaba ya BZ. di 13 hezarî de pêk hatiye her çiqas ne şer be jî ji ber ku bûye sedema mirina 61 kesan ji aliyê lêkolîneran ve cuda tê nirxandin. Bi demê re ev pevçûn ber bi şerên komî ve çûne.

Şerê Hamoukar (Hamoukar-Uruk/BZ. 3 hezar û 500-3 hezar û 300î) wek şerê yekemîn ên di nav bajar-dewletan de tê hesibandin. Li gor daneyên ku derketine lêkolîner dibêjinn ku urukî di şer de bi ser ketine û bajarê Hamoukar (Hesekê/Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê) piştî talanê li gor xwe dizayn kirine.

Heta pêşketina nivîsê ev şerên heyî êdî hatine qeydkirin jî. Şerê Megiddo (BZ.1457) di dîrokê de wek şerê yekemîn ê ku bi nivîskî hatiye qeydkirin e. Ev şer di navbera Fîrewnê 2. Thutmose û Koalîsyona Bajar-Dewletên Kenan (Megiddo, Kadeş, Mîtanî hwd) de pêk hatiye. Di encama şerê ku 7 mehan berdewam kiriye de Fîrewn bi ser ketiye.

Împaratoriyên wek Pers, Misir, Yewnan, Roma, Çîn hwd. hebûna xwe bi şeran dane berdewamkirin. Wek hemû şeran bi van şeran jî krîza di nav civakê de kûrtir bûye. Jin wek xenîmet hatine dîtin. Civak hatine kolekirin. Xweza hatiye tunekirin. Dîsa di her şerê ku pêk hatiye de rêbaza şerkirinê û amûrên ku pê hatine şerkirin jî zêdetir bûne.

Di serdema navîn de êdî şer dibe parçeyek jiyana mirovan. Di şerên mezin ên împaratoriyan de di Seferên Xaçperestan de di şerên Mogolan de, di şerê yekemîn û duyemîn ên cîhanê de ji ber pêdiviya berfirehbûna hişmendiya mêrperest pêk hatin.

**'Serdema mêrperestiya endustriyal'**

Bi pêşketina modernîteya kapîtalîst re şer ket qonaxek nû. Rêberê Gelê Kurd vê qonaxê wek 'serdema mêrperestiya endustriyal' pênase dike. Ji ber ku di vê serdemê de şer bûne komî, mekanîze bûne û bi tamamî ji bo berjewendiyên aborî bi pêş ketine. Di vê serdemê de êdî dewlet bûne mezintirîn amûrên şer.

Di şerên di nav dewletan de bi milyonan mirov mirine. Di şerê Mogolan de herî kêm 40 milyon kes mirine. Di şerê Napolyon de 4 milyon kes mirine. Di şerê 30 salan ê li Ewropayê de ji sê yek nifûsa Ewropayê miriye. Di serhildana Taîpîng de (Çîn/1850-1864/gel şerê komunîzmê da) herî kêm 20-30 milyon mirov mirin.

**Şerên cîhanî**

Di şerê yekemîn ê cîhanê de herî kêm 15-20 milyon însan bi çekên bi gule û çekên kîmyewî jiyana xwe ji dest dan. Di vê serdemê de çekên kîmyewî yên ku ji aliyê zanyaran ve hatine çêkirin dide nîşandin ku zanist bixwe jî di xizmeta hişmendiya mêrperest de ye. Ev zanista ku di bin serweriya hişmendiya mêrperest de ye jî bêguman li dijî civakê şerê xwe daye meşandin.

Dîsa şerê duyemîn ê cîhanê ji bo mirovahiyê enqazeke mezin e. Di vî şerê de herî kêm 60-70 milyon mirov jiyana xwe ji dest dane.

Li bajaran bombe hatine barandin. Bi çekên kîmyewî xweza hatiye texrîbkirin ku heta niha jî bandora wan didome.

Piştî şerên cîhanê yên mezin jî li gelek cihan şer qewimîne û mixabin li hin deveran hê jî şer didomin. Bêguman di serdema me de yek ji şerên ku li dijî mirovahiyê hat meşandin şerê DAIŞê yê li Rojava li dijî kurdan bû. Di van êrîşan de 13-15 hezar însan jiyana xwe ji dest dan. Bi hezaran kes ji cih û warên xwe bûn. Deverên dîrokî hatin tunekirin. Xweza hedef hat girtin. Bajar hatin tunekirin.

Dîsa şerê ku Îsraîl li dijî Xezayê dide meşandin di roja me de ji bo mirovahiyê şermeke mezin e. Di vî şerê de ku sala 2023yan dest pê kir, heta niha herî kêm 70 hezar filîstînî hatin kuştin.

Tê dîtin ku ji destpêka şerê yekemîn (şerê li dijî jinan) heta niha armanca sereke kûrkirina hişmendiya mêrperest e. Mixabin ev nêzikatî tenê di rûpelên dîrokê de nemane îro heman hişmendî di nêzikatiya hemû dewletan de heye. Hişmendiya mêrperest ji bo parastina berjewendiyên xwe ti rê nemaye ku bi kar neaniye.

Di nivîsa bê de em ê li ser rewşa jinan a di nav şeran de û şerê taybet ê ku niha tê meşandin bisekinin.



Adar Gulan

# Jin ji vê qonaxê re pêşengiyê dikin

Heqê me hindik be jî divê em behsa xisleta jêhatî ya şoreşgerî ya rabîrdûya têkoşîna rizgariyê ya neteweya kurd bike. Em ê ji temenpiçûkên welatê me re qala sedemên derketin û dengvedana vê dîroka legengiyê bikin. Ji şer hetanî lêhengiyên wê û birêvebirina kar û xebatên 47 salên Tevgera Azadiyê ji rûpelên berxwedana wê fêr bibin. Ji kêmasî û şaşiyên dîroka têkoşîna rizgariya neteweyî tecrûbeyan derbixin. Di wateya hebûn, rizgarî û vejînê de ji her rûpelek dîroka vê destanê û kaniya wê avê werbigirin. Bi lêgerîna pêşdîtina serdema borî, ji nifşan re ahenga têkiliya ruhê biryara gava yekemîn a avakirina têkoşînê vebêjin.

Di serdema şerê rizgariyê yê neteweyî de jin bi tevahî hêza xwe beşdarî nav refên têkoşîna azadiyê bûn. Di pêşengiya wan de, xwerêvebirin bû mînaka îlhamê ya afirîneriya jiyanê. Hatina jinan a nav refên şoreşê û meşa wan a azadiyê, di derfetên gelekî zor û zehmet de pêk hat. Ref bi ref, ew rêyên dirêj ên ber bi şoreşê ve digirtin. Ji fermandariyê hetanî birêvebirina şerê çekdarî li seranserî çar hêlên Kurdistanê, jinan li hember mêtingeriyê rolên girîng listin. Hem parastina xwe û hem jî ya xaka xwe bi cih anîn. Bi ruhê erka welatparêziyê, beşdarî têkoşîna şerê çekdarî ya şoreşa Kurdistanê bûn.

Jinên kurd, di dîroka têkoşînê ya şerê rizgariya neteweyî de xwe îsbat kir ku ew dikare erka pêşengiyê ya avakirina şoreşa Kurdistanê pêk bîne. Di rastiya dîroka Kurdistanê de, vê pêşketinê bi xwe re şoreşa civakî/zihnî çêkir. Jinên têkoşer, li hemû eniyên şoreşê berpirsyariyên dîrokî û erkên xwe yên şoreşgerî di her astê de bi cih anîn. Barên giran ên xebatên şoreşê li milê xwe girtin. Barê şoreşê barekî giran e. Jê re, îrade divê. Mejiyê şoreşa Kurdistanê yê avakirina hêza civaka demokratîk, bi bîreweriya meşandina xebatên xweser a rêxistinî bi pêş de çû. Di hêla pêşvebirin û pratîzekirina hişmendiya neteweya demokratîk de, biryarên ku jinan girtine ji bo veguhertina civaka mêran bandoreke erênî kir...

Ji bo ku em bi ewayekî rast li vê mîrateyê xwedî derkevin, di pêvajoya diyalogê de lêgerîn û hewldanên jinan ên xwebirêxistinkirinê, bi ravekirina rewşa Kurdistan û Tirkiyeyê ve girêdayî girîngiya wê tê dîtin. Hin xalên bingehîn mijara nûjenkirina şêwaza birêvebirinê ne, ku ji nû ve bên nirxandin. Di şert û mercên Tirkiyeyê de, lihevkirina bi rastiya civakê û hemû pêkhateyan re, ji bo bihevrejiyanê gelek mihîm e. Ji ber vê yekê divê jin di pergala gotûbêjkirina rêya çareseriyê de bi rolên sereke yên lihevkirinê de cihê xwe bi ewayê girseyî bigire. Bi analîzkirina pergala şer ya serdema rizgariya neteweyî, ew ê asoya me fireh bike ku pêdiviya xwe ya nûkirin û avakirinê bibîne. Bêşik ev divê yek ji beşên esasî yên rêxistinkirina civakê be.

Girêdayî vê rastiyê, analîzkirina jinûve ya rewşa siyasî û civakî ya niha, girîngiya vê pêvajoyê û rêya çareseriyê radixê ber çavan. Ji xweziyan wêdetir, ji bo vê yekê perspektîfeke dîrokî hewce ye ku jin rewşa heyî, ji nû ve bidin ver xwe. Li ser vê bingehê helbet em ê roleke dîrokî di konaxa 2yemîn a pêvajoya diyalogê de werbigirin. Di vê pêvajoyê de rêbaza bingehîn, bêguman xwejinûvebirêxistinkirin e. Ev karê esasî yê dema bê ye. Divê li pêşiya her ferdekî civakê, plansaziya xebatê ya aştiyê bê neqişandin. Xebata aştiyê, jixwe karekî zehet e. Pêdivî ew e ku em ji nakokiyên civakê re nexasim jî ji nakokiyên jinan re bibin bersiv ku tevahî jin biherikin nav xebatên xwebirêxistinkirinê. Divê jin, weke diyardeya ku aştiyê xurt dike bên dîtin. Ji lewra, bê jin aştî, ew ê şaştiyê bîne! Bi vê boneyê divê em pirsgirêkên civakê ne bi hişmendiyeke hilweşîner, lê bi perspektîfeke diyalektîk ya guhertinê tevbigerin û jê re çareserî bibînin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di nirxandineke xwe de civakê wiha pênase dike: "Civak ne avaniyeke çînî ya ji yek tebeqeyê ye, civak qadeke têkoşînê ya li ser bingeha zayendê ye, dîrokê ye ku ji gelek tebeqeyan ava bûye. Pirsgirêka destpêkê û ya herî mezin a mirovahiyê derketina şoreşa dijber e, ku bi kolekirina jinan re pergala serdestiyê ava bûye."

Di vê çarçoveyê de, heke ji têkoşîna ku tê xwestin encamek baş dernekeve, divê nexwe em teqez di şêwaza têkoşîna xwe de nûjenkirinê esas bigirin. Her çend di rêvebirina diyarkirina çarenûsê de zehmetiyên xwe hebin jî, di wergirtina biryaran de divê girîngî bi hatinacemhev were dîtin. Bi girêdana mafê çarenûsê yê xwerêvebirinê de, berpirsyariyên jinan gelek in. Em dizanin ku îro dem dema li ser esasê meşa ber bi rizgariya demokratîk ve, mezinkirina têkoşînê ye. Pêkanîna vê zêdetir dikeve ser milê me jinan. Ji wê boneyê dem dema xîretê ye. Di vê rêyê de li şûna desthilatdariyê, ew ê rêveberiya civaka demokratîk bi pêşengiya jinan bigihîje serkeftinê. Bi vê hişmendiyê Tevgera Azadiyê ya jinên kurd, xwe gihandiye nûjenbûna îdeolojîk ya paradîgmaya civakî ya gelparêziya azadiyê. Ji lewma jin îro, weke dînamîzma herî mezin a têkoşînê ye. Di feraseta Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê de, jin dînamîka bingehîn a hêza veguhertinê ye. Gelo ma hewce ye ku em kûrahiya dîroka vê têkoşînê ji serî heta binî vebêjin? Lê bi baweriya min ew ê ne lazim be ku em dakevin hûrguliyên her çiqilek ji dîroka wê. Mimkun e dibe ku hinek bixwazin ji bo bicihkirina vê rastiyê, rûpelên dîroka vê mîrateya mezin vekolin. Bi parastin û hevsengiya têkiliyên demokratîk a navbera jin û mêran de ev dikare bi pêşdîtinên nûjenkirina hişmendiyê pêk were. Di sazûmankirina rewakirina xebatên aştiyê de, rêber/sergovendiya nûnertiyê di destê jinan de ye...

Gelek mijar hene ku jin ji bo xwe bikin hinceta têkoşîna azadiyê. Divê jin, têkoşîneke bi pergalî bide meşandin ku encamên baştir werbigire. Helbet zehmet e ku mirov bi normên takekesî, li dijî rejîmên zordest ên totalîter ên cîhanê bi tena serê xwe bikaribe bi ser bixîne. Jixwe li dinyayê pêla rejîmên rastgir ên totalîter belav dibe! Bi xurtbûna van rejîman re, li seranserî cîhanê xeteriya li ser jiyana jinan, zêde bûye. Li hemberî polîtîkayên rejîmên rastgir, totalîter pêdivî bi hevgirtinek hîn xurtir ya tevgerên jinan heye. Her wiha li Rojhilata Navîn ku zor û zehmetiyên wê hene, beşdarbûna jinan a nav siyasetê û lêgerînên ji bo têkoşîna azadiyê bi tena serê xwe şoreşek e. Belê tevî hemû zehmetiyên pêvajoyê jî, jinên têkoşer beriya her tiştî di zanebûna rolên xwe de di tevgera pêvajoya çareseriyê de bi xurtî beşdarî xebatê dibin. Bi vê re tevlîbûna tevahî jinên Tirkiyeyê hedef e, bi hewldanên wisa girîng pêvajo dikare veguhere pêngava aştiyek civakî. Jinên kurd, ji vê qonaxa nazik a aştiyê re, pêşengiyê dikin...

# Dest guherî, lê siyaseta Şamê neguherî

| Mehmet Alî Ertaş

Dîplomat Nûrşan Hisên diyar kir ku di salekî HTŞê de siyaseta Şamê nehatiye guhertin û got: "Dest guherî, lê siyaset neguherî. Hêzên tifaqa gelan naxwazin hene. Dixwazin gelan bi hev bidin şerkirin. Lê gel baweriya xwe bi Rêveberiya Xweser tîne."

Salek berê, 8ê kanûnê, HTŞ ket Şamê û li ser textê rejîma Esad rûniştin. HTŞê bi hevkariya hêzên derve dawî li rejîma Esad a 51 salî anî û hikûmeta demkî ava kir. Her çend îdia kir ku dê ji bo hemû gelên Sûriyeyê aramî û edaletê bîne jî di serweriya HTŞê de di salek borî de 8 hezar û 500 mirov hatin kuştin. Bi hezaran mirov ji cih û warên xwe koç bûn û bi hezaran mirov hatin revandin. 10ê adara 2025an, HSD û HTŞê ji bo Sûriyeyeke demokratîk peymana tifaqê îmze kir. Lê HTŞ şertên peymanê binpê dike û bi cih nayne. Hevseroka Meclisa Dîplomasiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Nûrşan Hisên têkildarî feraseta HTŞê ya li ser herêmê û saleke HTŞê nirxand. Hevserok Nûrşan Hisên bal kişand ser rewşa Şamê ya beriya HTŞê û got: "Beriya ku HTŞ li Şamê bê ser hikûmeta demkî ya Sûriyeyê, siyaseta înkarkirina gelê kurd û rengên din hebû. Li ser gelê kurd polîtîkaya înkarê hebû. Di serdema Hafiz Esad û di serdema Beşar Esad de nêzî 50 salan polîtîkaya înkarê hat meşandin."

**'Êzidî wekî misilman dihatin dîtin'**

Nûrşan Hisên bal kişand ser dema rejîma Esad û got: "Siyaseta li dijî hebûna kurdan hat meşandin. Nasnameya kurdan û baweriyên din înkar dikirin. Ola êzidî wekî misilman, kurd jî wekî ereb dihatin dîtin. Siyaseta qirkirina çandî dihat meşandin. Esad di polîtîkayên şovenîst de israr kir."

**'Êşa berê li qada HTŞê didome'**

Nûrşan Hisên li ser saleke HTŞê jî rawestiya û got: "Hikûmeta demkî salek e rengînî û zengîniya baweriyan û pêkhateyan nabîne. Dixwaze bi siyaseta berê bi rê ve bibe. Ji bo rêveberiyeke demokratîk em di nav hewldanên diyalogê de ne. Salek e di siyasetê de guhertin tune ye. Herêma HTŞê herêmeke kompleks e. Li hin cihan hîn artêşa Sûriyeyê nebûye yek. Gelek kom û komikên girêdayî dewleta tirk û girêdayî hêzên cîhanê hene. Di vê salê de gelek kuştî pêk hatin. Li herêma Beravê li herêmên din nêzî 2 hezar mirovên elewî, jin û zarok hatin kuştin. Li Siwêdayê nêzî hezar mirovên sivîl hatin kuştin. Bajarê Efrîn, Girê Spî, Serêkaniyê, Ezaz, El Bab hîn di bin dagirkeriya Tirkiyeyê de ne. Bi sed hezaran mirovên Efrîn, Serêkaniyê di bin çadiran de dijîn û nikarin vegerin malên xwe û ser axa xwe. Hîn dewheta tirk li Efrînê mufredata perwerdehiya tirk li dibistanan dide xwendin. Efrînê wekî bajarê Tirkiyeyê dibînin. Dest datînin ser mal û milkê welatiyan. Ev kiryarên li ser herêmê bi awayekî plankirî tên meşandin. Salek e êşa berê dubare dibe."

**'Peymana 10ê Adarê taloq dikin'**

Nûrşan Hisên li ser hewldanên dîplomasiyê û peymana 10ê adarê jî rawestiya û wiha pêde çû: "Ji bo Sûriyeyeke demokratîk û aram, hewldanên me yên ji peymana 10ê adarê didomin. Rêveberiya Xweser ji bo komkujî bi dawî bibin û hemû pêkhate di nav aştî, aramî û demokrasiyê de bijîn her tim di nav hewldanan de ye. Gelek hevdîtin pêk hatin, gelek tifaq pêk hatin. Lê ev peymana tifaqan bi zanebûn nehatiye îmzekirin. Heta astekê tifaq heye. Ji bo entegrasyona HSD a Artêşa Sûriyê hewldan



hene. Ji bo HSD bi fermandarî û cewherê xwe derbasî Artêşa Sûriyeyê bibe heye. Ev hewldan ji aliyê hikûmeta demkî ve heta astekê hatiye erêkirin. Niha tê xwestin ku ev tişt bi destûra bingehîn û îmzekirineke fermî têkeve pratîkê. Ji bo dosyayên perwerdehiyê, pergala giştî ya navendîbûnê hilweşe û pergala nenavendîbûnê bê qebûlkirin û di destûra bingehîn de bê qebûlkirin. Yek ji xala peymana 10ê adarê xala vegera welatiyên koçber e. Heta veger nebe demografiya hatiye xerakirin rast nebe aştiyek mayinde pêk nayê. Peymana 10ê adarê armanc dike ku hemû koçber vegerin warên xwe."

**'Enqere zextan li Şamê dike'**

Her wiha Nûrşîn Hisênê li ser têkiliya komên çekdar ên li Efrînê û dewleta tirk diyar kir ku biryarên wan koman ji aliyê dewleta tirk ve tên dayîn û wiha domand: ''Enqere û Şam girêdayî hev in. Enqere polîtîkayên xwe li ser Şamê ferz dike. Dema hikûmeta demkî li ser Girê Spî, Efrîn, Serêkaniyê gaveke erênî biavêje, Enqere zextan lê dike. Dema ku zextên wê kêm bibin û di navbera hikûmta demkî û Rêveberiya Xweser de diyalog bi pêş bikevin, ev pirsgirêk dê çareser bibin. 1ê nîsanê ji bo gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê peyman hat îmzekirin, lê heta asta dawî pêk nehat."


Nûrşan Hisên li ser komkujiyên Durzî û elewiyan jî rawestiya û got: "Rojane gefan li ser herêma Rêveberiya Xweser didomin. Di salvegera ketina Esad ji desthilatê de, gelek çalakî hatina. Di van çalakiyan de sloganên binefret li dijî HSDê û Rêveberiya Xweser hatin berzkirin û hêrsa xwe ya li dijî HSDê nîşan dan. Li aliyekî peymana 10ê adarê tê nîqaşkirin, li aliyê din gefan dixwin. Dixwazin dîsa xwîna gelê Sûriyeyê birije. Êrişên li dijî elewî û durziyan jî nîşan didin ku dixwazin li Sûriyeyê dîsa xwîn birije. Hêzên ku dixwazin gel û baweriyan bînin hemberî hev hene. Lê êdî baweriya gel bi parastina cewherî heye.'

Nûrşan Hisên li ser hewldanên Rêveberiya Xweser ên ji bo Sûriyeya demokratîk jî rawestiya û got: "Avakirina Sûriyeyeke demokratîk, ne navendî, erka me ye. Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo Sûriyeyeke nenavendî û demokratîk bi hezaran şehîd dan. Ne ji berdêlên giran bûya niha DAIŞ li Şamê rûniştîbû. Di parastina Sûriyeyê de HSD, YPJ û YPG aktorên sereke bûn. Em destpêka avakirina Sûriyeyeke demokratîk li ser esasê entegrasyona demokratîk dibînin. Em hewl didin ku her du alî hev bi reng û nasnameya xwe qebûl bikin. Çawa ku em hikûmeta Şamê qebûl dikin, divê hikûmeta Şamê jî bi awayekî fermî me qebûl bike. Divê rêveberiya cewherî û xweser bi awayekî fermî biparêze. Pêkhate bi hev re dikarin azad û wekhev bijîn. Azadiya jin, ol û baweriyan û hevjiyana azad li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek li pêş e. Gel li dijî polîtîkayên gel tîne hemberî hev hişyar e. Gel di avakirina Sûriyeyeke demokratîk de hêviyekê dibîne. Eger peymana 10ê adarê bi awayekî erênî pêk bê, dê Sûriye ji şerekî navxweyî bê parastin. Êdî gel xwe bi rêxistin kiriye."

# 'Statuya zimanê kurdî nas bikin'

| Xecê Şen

Polîtîkayên bişaftin û qedexekirinê li ser ziman, çanda kurdî bi salan e didomin. Di navbera 2024-2025an de gelek çalakî û xebatên ziman û çanda kurdî hatin lidarxistin. Lê ev xebat ji aliyê dewletê ve hatin astengkirin û qedexekirin. Di 8emîn Fuara Pirtûkan a Amedê de gelek pirtûkên bi zimanê kurdî hatin qedexekirin. Zarokên kurdan ji ber axaftina bi kurdî rastî êrişên nijadperestan hatin. Komîsyona meclisê li meclisê axaftina Dayikên Aştiyê ya bi kurdî asteng kirin. Li ser polîtîkayên dewleta tirk ên derbarê zimanê kurdî de û qedexekirina ziman de, mafê perwerdehiya bi zimanê kurdî, zimanê aştiyê û statuya zimanê kurdî, em bi hevberdevkê Komîsyona Ziman, Çand û Hunerê ya Dem Partiyê Heval Dilbihar re axivîn. Heval Dilbihar bal kişand ser polîtîkayên qedexeker ên dewleta tirk û got: "Dewleta tirk sed salan li ser zimanê kurdî polîtîkayên bişaftin û qedexekirinê meşandin, zimanê kurdî qedexe kir. Ji ber ku dewleta tirk baş dizanî, heta ku zimanê kurdî ji holê raneke nikare neteweya kurd ji holê rake û hebûna xwe ya tirkperest biparêze. Lê di encama têkoşîna gelê kurd de ev polîtîkayên dewleta tirk bi ser neketin û têk çûn. Zimanê kurdî hê jî bi awayekî fermî nayê nasîn, perwerdehiya bi kurdî nîn e, kurdî di hemû sazî û dezgehên dewletê de qedexe ye. Hemû jîngeh di nav dorpêçê de ye. Li şûna navên kurdî navên tirkî li wan hatine kirin."



Heval Dilbihar li ser pêvajoya aştî û civaka demokratîk, perwerdehiya bi zimanê kurdî û qebûlkirina statuya zimanê kurdî wiha axivî: "Ji bo li welatekî aştiyek pêk bê, divê berî her tiştî maf û nirxên hemû kom, gel û neteweyan bên qebûlkirin. Kîjan derdor bixwaze bi neteweya kurd re bijî divê berî her tiştî li ser bingeheke azadîparêz û demokratîk hebûn û mafên wan qebûl bike. Ji bo wê jî divê dewleta tirk hemû qedexeyên li pêşiya zimanê kurdî rake; çand, nasname ax û hemû nirxên kurdan qebûl bike. Divê zimanê kurdî di zagona bingehîn de bibe xwedî statu û zimanê perwerdehiyê. Divê navê gund, tax û hemû cih û warên kurdan careke din li resenbûna xwe ben vegerandin, bibin kurdî. Divê mafên ziman û perwedehiya bi kurdî di rêveberiyên xwecihî û hemû saziyan de bên sazkirin."

Heval Dilbihar der barê komxebat û deklerasyona 750 sazî û înîsiyatîfên kurdan dane de got: "Li Wanê komxebatek hat lidarxistin. Derdorên kurd stratejî û polîtîkayên xwe diyar kirin. 750 saziyên cuda bi nasnameyên xwe yên sazîbûyî ji bo zimanê kurdî deklerasyonek weşand. Xwestin biryarên ku hatine wergirtin û bi raya giştî re hatine parvekirin li ser kaxizê nemînin. Ji rêveberiyên xwecihî, xwestin ku qada siyaset, hiqûq, çand, ekolojî, tenduristî, jin, ciwan, aborî û hemû beşên civakê wek parêzvanê zimanê kurdî têbikoşin; ji bo sazkirina pergaleke mayinde ya parastin û pêşvebirina zimanê kurdî li hemû jîngehên li Kurdistanê û derên ku kurd lê dijîn komun û meclisên zimanê kurdî ava bikin, xebatên kurdî bikin; zimanê kurdî bikin zimanê civakê yê jiyanî; her derê bikin dibistan û zanîngehên kurdî."

# Îşkenceyê li girtiyan dikin

| Yilmaz Yilmaz

Binpêkirinên li girtîgehan her ku diçe zêdetir dibin. Li gorî daneyên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ên sala 2025an, hezar û 412 girtiyên nexweş hene. Di pêvajoya ku nîqaşên ji bo aştî û civaka demokratîk tên kirin û daxwazên berdana girtiyên siyasî zêde dibin de, li şûna zextên li ser girtiyan bi dawî bibin û girtiyên siyasî bên berdan, tundiya li ser girtiyan zêde dibe. Di nûçeyên 10 rojan ên der barê girtî û girtîgehan de di ajansan de hatine parvekirin, wêneyê îşkence û tundiya li ser girtiyan nîşan dide. Kurtenûçeyên li jêr hatine parvekirin rastiya polîtîkaya hikûmetê ya li dijî girtiyan nîşan dide. Çend mînakên zext û tundiya li ser girtiyan wiha ne:

**Li 7 girtiyan ceza birîn**

Li 7 girtiyên li Girtîgeha Tîpa L a Kalkandere ya Rîzeyê tên ragirtin, bi hinceta ku di pêşbirkekê de peyvên "Mahabad" û "Kurdistanê" derbas kirine, cezayê disîplînê hate birîn. Girtiyan di navbera xwe de pêşbirk li dar xist û di wê navberê de bi ser qawîşan de hate girtin û kaxizên pirs li ser bûn, hatin desteserkirin

**Girtî tevî raporê nayê berdan**

Nivîskar û girtiyê nexweş Mehmet Serhat Polatsoy ê ku li Girtîgeha Hejmar 2 ya Tîpa T a Rihayê tê ragirtin, tevî nexweşiyên wekî KOAH, astima kronîk a alerjîk, romatîzmaya dil û alerjiyê, di girtîgehê de ye. Polatsoy 29ê gulana 2025an li Beşa Îmmûnolojiyê ya Nexweşxaneya Mehmet Akîf Înan di testa damar û alerjiyê ya "KOL"ê re derbas bû. Di encamê de hat diyarkirin ku "mayîna wî ya li girtîgehê ne pêkan e". Girtî tevî raporê jî nayê berdan.



**10 gardiyanan li girtiyekî da**

Li Girtîgeha Tîpa S a Kirşehîrê binpêkirinên mafên mirovan ên girtiyên siyasî didomin. Yûnûs Ozak ê ku ferzkirina "nîzama leşkerî" qebûl nekiriye, gardiyanan lê daye. Yunus Ozak anî ziman ku gava xwestiye mafê xwe yê hevdîtina bi rêya telefonê bi kar bîne, gardiyanan êrîşî wî kiriye û got: "Gava ez li odeya telefonê bûm, sergardiyan ji min re got "di nîzama leşkerî de be" û ji ber ku min ev yek qebûl nekir herî kêm 10 gardiyanan êrîşî min kir û li min da."

**'Bi zorê li ser piyan dimîne'**

Mehmet Emin Çam (73) ku ji aliyê ÎHDê ve wekî girtiyekî nexweşê giran tê diyarkirin û tevî du krîzên wî yên dil, daxwazên wî yên berdanê hatine redkirin, rewşa wî ya tenduristiyê krîtîk e. Keça wî Şîmel Çam ku 3yê mijdarê li Girtîgeha Tîpa T ya Êlihê serdana bavê xwe kir, got: "Bavê min heta ku gihîşt kabîna serdanê xwe bi dîwaran ve girt. Bi zorê li ser piyan dima." M. Emîn Çam di mehekê de 4 caran sewqî nexweşxaneyê hat kirin.

**Girtiyê 31 sal in girtî ye bernadin**

Tehliyeya Mehmet Saît Yildirim ê li Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê tê ragirtin û 31 sal in girtî ye, bi hinceta ku gotinên Seyîd Riza yên di dema darvekirinê kiribû de dubare kiriye, 9 mehan taloq kirin. Şaxên ÎHD, ÇHD, OHD û TUHAY-DER ên Îzmîrê û Nûnertiya THÎVê ya Îzmîrê têkildarî girtiyê nexweş Mehmet Saît Yildirim (74) li Girtîgeha Hejmar 1 a Tîpa F a Kiriklar a Îzmîrê tê ragirtin û nayê berdan, daxuyanî da û xwestin girtiyên nexweş serbest bêne berdan.

**Îşkenceyê li girtiyan dikin**

Hevserokê TUHAY-DERê Zahir Akalin destnîşan kir ku girtiyên li Girtîgehên Ewlehiya Bilind ên Tîpa F ya Kurkçuler a Edeneyê û Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Hejmar 1 a Sûlûca ji mafên xwe yên herî bingehîn bêpar tên hiştin û got: "Ferzkirina kontrola dev" ji sala 2019an ve li Girtîgeha Tîpa F ya Kurkçuler û Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Hejmar 1 a Sûlûca di meriyetê de ye, berdewam dike. Li Girtîgeha Tîpa F ya Kurkçuler a Edeneyê 19 girtiyên nexweş hene ku pênc ji wan bi giranî nexweş in û li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Hejmar 1 a Sûlûca jî 20 girtiyên nexweş hene ku 4 ji wan bi giranî nexweş in.

3 girtî bi lêdanê sirgûn kirin

Li Girtîgeha Erzînganê 3 girtiyên siyasî yên li dijî zextan çalakiya greva birçîbûnê li dar dixistin, hatin sirgûnkirin. Di dema sirgûnkirinê de li girtiyan xistin.

**Girtiyê nexweş sewqî ATKê nakin**

Li girtîgehan ku gelek binpêkirinên mafan tên kirin, girtiyên nexweş bi mirinê rû bi rû ne. Ramazan Kortak ku 30 sal in di girtîgehê de ye, yek ji wan girtiyên nexweş e ku li ber mirinê ye. Nexweşiyên Kortak ên weke tansiyon, mîde, serêşî, êşa piyan hene û kîsikê zirav jî hatiye girtin.

**Bi kelepçeyê li nexweşxaneyê ragirtin**

Li Girtîgeha Tîpa F ya Kurkçulerê girtî Haci Alagaş ku li girtîgehê krîza dil derbas kir, hefteyekê di beşa çavdêriya awarte de hem dest hem jî piyên wî kelemçekirî hate ragirtin. Keça Alagaş, Sofya Alagaş banga hestiyariyê li raya giştî kir.

# PÊWÎSTE DEWLET JI BO MAFÊ HÊVIYÊ GAV BAVÊJE

# ‘Azadiya Ocalan garantiya aştiyê ye’

Xecê Şen

Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ku 18ê adara 2014an li ser azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan biryar da ku ji mafê hêviyê sûdê werbigire û bê berdan. Li gorî xala 90î ya Destûra Bingehîn Tirkiye mecbur e ku biryara DMMEyê esas bigire û mafê hêviyê pêk bîne. Lê Tirkeyeyê 11 sal in ev biryar pêk neaniye. Tirkiyeyê di plana xwe ya çalakiyan a meha hezîrana 2025an a pêşkêşî Konseya Ewropayê kiribû, aşkere diyar kiribû ku dê der barê mafê hêviyê de ti tedbîran jî wernegire. Li ser helwesta Tirkiyeyê, Konseya Ewropayê, îlona 2024an, ji bo mafê hêviyê salek dem dabû Tirkiyeyê û dîsa îlona 2025an jî dîsa taloq kir û 9 mehên din dem da Tirkiyeyê. Dîsa komîteyê, îlona 2025an, ji bo mafê hêviyê ji ‘Komîsyona Demokrasî, Xwişkûbiratî û Hevgirtina Millî’ xwestibû û gotibû; “Komîsyona ku li meclisa Tirkiyeyê hatiye avakirin ji vê yekê berpirsyar e û divê komîsyon li ser mafê hêviyê jî karê xwe bike û pêşniyarên xwe bo meclisê ragihîne.” Herwiha di çarçoveya mafê hêviyê û azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û banga wî ya Aştî û Civaka Demokratîk de, “Konferansa Aştî û Civaka Demokratîk”, 6-7ê kanûnê, li Stenbolê konferansek pêk anî. Li konferansê peyama Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat xwendin. Li ser mafê wî yê hêvî û azadiyê, bandora wî ya li ser fîlozofên cîhanê û rola wî ya di pevajoya aştiyê de û li ser konferansa ku li Stenbolê pêkhatî, hevserokê giştî yê Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) Serhat Çakmak pirsên me bersivandin.

***Eger ku sermuzakerevanê pêvajoya aştiyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan be, çima heta niha ne azad e?***

Ez dixwazim di serî de vê bibêjim, pirsa we paradoksa vê erdnîgariyê ye. Divê hin tişt ne bi mantiqa rastiyê, lê bi berjewendiyên hegemonyayê werin ravekirin. Divê ev pirs bi pirseke din wiha were bersivandin: Ger kurd mafdar in, çima sed sal in mafên wan nehatine dayîn? Bi heman awayî, ger Ocalan di vê rewşê de be, çima hîn jî girtî ye? Ji ber vê yekê, tişta ku divê, tişta ku heye her gav di heman xalê de li hev nayên. Mixabin, tiştên heyî û tiştên ku divê hebin niha ji mantiqê dûr in. Lê divê baş were zanîn ku azadiya Ocalan û jiyana wî ya di şert û mercên guncav de were bicihkirin, wê demê azadiya wî jî dibe garantiya aştiyê û pêvajoya çareseriya demokratîk. Herwiha ev dê ji bo Tirkiyeyê jî sûdmendtir be.

***Konferansa Aştî û Civaka Demokratîk a Navneteweyî, 6-7ê kanûnê li Stenbolê hat lidarxistin. Ji konferansê ji bo aştiyê encameke çawa derket?***

Ji bo organîzekirina konferansê gelek hewldan hatin dayîn. Gelek xebat ji bo diyarkirina naveroka konferansê, dîtina axaftvanan, amadekirina alavên teknîkî, agahdarkirina çapemeniyê û beşdaran hatin kirin. Berî her tiştî, ez bi dilgermî spasiya xwe li hemû hevkaran dikim ku beşdarî vê hewldanê bûn. Girîngiya vê pêvajoya aştiyê tenê bi rêya konferansek wiha dikare were nîşandan. Yek ji encamên wê yên herî girîng ew e ku têkoşîna kurdan ji bo demokrasiyê li seranserê cîhanê belav bûye û ev rastî ne tenê ji hêla kurdan ve di heman demê de ji hêla welatiyên cîhanê ve jî tê nîqaşkirin. Ev jî nîşan dide ku rewatiya têkoşîna demokratîk a sedsalî ya kurdan ji aliyê tevahiya cîhanê ve hatiye qebûlkirin. Lê belê pergala serdest hîn jî li hember vegerandina wê meşrûiyetê li ber xwe dide. Ev konferansa ku têkoşîna mafdar a kurdan û herwiha pergala alternatîf a ku wan pêşkêşî gelên cîhanê kir, baleke mezin kişand ser xwe û nîşan da ku hîn jî hêvî ji bo jiyaneke alternatîf heye. Konferansê herwiha nîşan da ku kurd di çarçoveya siyaseta demokratîk de hem hêzek îdeolojîk û hem jî rêxistinkirî ne û wan nîşan da ku ew amade ne di siyaseta demokratîk de jî têkoşînek bibandor bidin. Bi taybetî çapemeniyê teqez kir ku ji bo herkesî li Tirkiyeyê organîzekirina konferansek wiha dê pir dijwar be. Ev yek girîngiya vê konferansê nîşan dide.

***Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo konferansê peyam şandibû, peyama wî ji aliyê delegasyonê ve çawa hat nirxandin?***

Peyama ku birêz Ocalan ji konferansê re şand, coşek mezin çêkir. Naverok pir sade bû, lê peyamek zelal û xurt bû. Ew tê qebûlkirin ku pergala wî ya hizrê ne ji ya ku wî berê got cuda ye, lê belê xalek baştir tê qebûlkirin. Ji bo kurdan behsa qonaxa ku têkoşîna çekdarî gihîştiye armanca xwe, êdî pêwîstiya baştir a tevlîbûna di nav pergala demokratîk de û pêwîstiya naskirina qanûnî kir. Wî herwiha rave kir ku çima ev tişt pêwîst bûn. Birêz Ocalan, bi nihêrîna li rastiya dîrokî, diyar kir ku çima jiyana bihevre li herêma Mezopotamyayê hewce û girîng bû. Herwiha anî ziman ku kîjan pergal ji bo jiyana hevbeş pêwîst e. Wî bi awayekî pergalsazî anî ziman ku çima pergala moderniteya demokratîk ji bo gelên Rojhilata Navîn pêwîst e. Mixabin, di cîhana îroyîn de ti teorîsyen an jî siyasetmedar nîn in ku pêşniyarên wisa berfireh pêşkêş bikin. Em dikarin bêjin ku raman, nêrîn û felsefeya birêz Ocalan bi eleqe û meraq tên pêşwazîkirin.

***Ev konferans dê bandoreke çawa li ser siyaseta Tirkiyeyê û pêvajoya çareseriyê bike?***

Di vê konferansê de li ser pêvajoya çareseriyê, rêbazên demokratîk ên ku di vê pêvajoyê de werin avêtin û gavên ber bi demokratîkbûnê ve werin avêtin nîqaşên berfireh hatin kirin. Hat dîtin ku kurdan baweriya xwe bi pêvajoyê aniye û derdorên navneteweyî jî piştgirî dan vê pêvajoyê. Hêviya sereke ew e ku dewlet êdî pêvajoya agirbestê li ser bingehek yasayî bi pêş bixe û ji bo vegera çekdarên PKKê qanûn bên amadekirin. Wekî din, piştî serdema veguhêz, gavên ber bi demokratîkbûnê ve divê rêziknameyên der barê pênasekirina hemwelatîbûnê, mafê zimanê dayikê, xurtkirina rêveberiyên herêmî û rakirina rezervasyonên der barê peymanên navneteweyî de di nav xwe de bihewînin. Ev gav, digel rêziknameyên yasayî yên ku têne danîn, dê hawirdorek bê pevçûn li welêt xurt bike. Bi avakirina aştiyê re, rêyek ber bi çareserkirina pirsgirêka sedsalî, bi rêbazên demokratîk ve dê were girtin. Wekî din, aştî dê pêşketinê di demokratîkbûn û serdestiya hiqûqê de bîne.

***Fîlozof John Hollonway di konferansê gotibû: “Bi hezaran kilometre ez ketim pey ronahiya Ocalan û ronahiyê ez anîm vir”. Hûn vê tesbîtê çawa dinirxînin û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bandoreke çawa li cîhanê kiriye?***

Me careke din dît ku gotûbêjên Ocalan û serpêhatiyên kurdan bi baldarî tên şopandin. Her fikrek nû ku hêviyek nû pêşkêş dike, ji hêla mirovan ve bi eleqe û meraqeke mezin tê pêşwazîkirin. Divê gotinên fîlozof John Hollonway jî di vê çarçovê de werin xwendin û nirxandin. Di heman demê de, ev daxuyanî berpirsyariyek mezin jî da ser milê kurdan. Wî got ku kurdên ku pergalek alternatîf û jiyanek alternatîf pêşniyar dikin, berpirsyariyê ji bo wê tekoşîna demokratîk jî hildigirin ser milê xwe. Ji ber vê yekê, divê em her gav vê berpirsyariyê bi cih bînin û nebin amûrên pergala heyî. Ji ber vê yekê, peyama John Hollonway, hem pesn e û hem jî berpirsiyariya me destnîşan dike. Pêdivî pê heye ku peyam ji du aliyan ve were dîtin.

***Rola Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a di pêşxistina vê pêvajoyê de çi ye?***

Ew rastiya ku ramanên Ocalan di konferansekê de ji aliyê gelek kesên ji neteweyên cuda ve hatine nîqaşkirin jî helwesta wî di vê pêvajoyê de nîşan dide. Her çend serokê MHPê pêvajo dabe destpêkirin jî, Ocalan berpirsyarî û rîskên sereke yên vê pêvajoyê girt ser xwe. Heta niha, wî ev pêvajo bi ked û disîplîneke mezin meşandiye. Wî piştrast kir ku pêvajo ji zemîna pevçûnê hatiye derxistin û ji bo ku bê nîqaşkirin hatiye ser maseya gotûbêjê. Birêz Ocalan dîsa piştrast kir ku ew bê pirsgirêk hatiye vê qonaxê. Bandora wî ya li ser rêxistinê dîsa hat dîtin. herêmeke kaoktîk a wek Rojhilata Navîn, divê ev derfet bi bandor were bikaranîn. Bi vê derfetê, mirov dikare texmîn bike ku piştî ku Tirkiye aştiya navxweyî bi dest bixe, ew ê li Rojhilata Navîn û cîhanê çiqas xurt bibe. Divê ev were dîtin. Dema ku ev bi zelalî were dîtin, wek mînak, çareserkirina pirsgirêka Rojava dê hêsantir bibe.

***Mafê hêviyê mafekî mirovî û gerdûnî ye lê çima heta niha ev maf ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk nehatiye?***

Biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ya li ser mafê hêviyê ya ji bo birêz Abdullah Ocalan mafek e ku divê bi awayekî yasayî were bicihanîn. Ev biryarek e ku li gorî xala 90î ya makezagonê divê were bicihanîn. Nebicihanîna vê biryarê wek binpêkirina makezagonê ye. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê, meha îlon çûyî, diyar kir ku divê ev biryar were bicihanîn. Herwiha teqez kir ku divê komîsyona ku li parlementoyê hatiye damezrandin, ji bo vê yekê amadekariyan bike. Desthilatdarên siyasî der barê mafê hêviyê de ti rêkeftinek nekirine, da ku ew li ser birêz Abdullah Ocalan neyê sepandin. Ji ber ku meqam û rola wî ya di pêvajoyê de li ber çavan tê girtin, pir girîng e ku mafê hêviyê ji bo birêz Ocalan jî were sepandin. Guhertinek di qanûna înfazê de ji bo vê yekê bes e.

***Mirovekî girtî be dê çawa bikaribe rola xwe bilîze?***

Mixabin, nakokî tam jî di vir de ye. Nayê qebûlkirin ku kesek ku di vê pêvajoyê de ewqas berpirsyarî girtiye ser xwe, hîn jî di van şert û mercên tecrîdê de tê girtin. Dema ku rîskên pêvajoyê û îhtîmalên sabotajê li ber çavan tên girtin, pêwîst e ku birêz Ocalan di şert û mercên guncav de bixebite. Girtina wî di bin çavdêriyê de xetereyek mezin e. Ev ne tenê ji bo pêkanîna mafê hêviyê pêwîstiyek e, lê di heman demê de ji bo pêşveçûna pêvajoyê jî gavek pêwîst e ku divê bê avetin. Zehmetiyên ku di pêvajoya salên 2013-2015an de hatine jiyîn, xetereyên vê yekê tînin bîra me. Ji bo ku ev pirsgirêk careke din çênebin û kêmasî neyên jiyîn, divê ev sînor were derbaskirin. Pêwîst e hikûmet ji bo mavê hêviyê bêyî hesabên siyasî, divê gaveke wêrek bavêje.

***Ji bo mafê hêviyê di warê hiqûqî de heta niha çi xebatên berbiçav hatine kirin?***


Komeleya me, OHD, ligel baro û rêxistinên civaka sivîl ên ku em bi wan re dixebitin, bi hev re serlêdanên qanûnî dikin. Pêşî, parêzerên me piştrast kir ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê li ser mafê hêviyê biryarek bide. Piştre, me ji bo bicihanîna vê biryarê serî li Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê da. Komîteyê biryar xist rojeva xwe û ji bo bicihanîna wê salek da Tirkiyeyê. Piştî ku di nav salekê de tiştek nehat kirin, komîteyê piştî serlêdana me biryar ji nû ve nirxand. Di dawiyê de, diyar kir ku komîsyona ku di parlamentoyê de ji bo bicihanîna biryarê hatiye damezrandin ji bo rêziknameyên pêwîst berpirsiyar e. Eger komîsyon li ser vê mijarê pêşniyarekê pêşkêşî parlemento û komîteya edaletê neke, em wek Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) û saziyên din ên hiqûqî, dê ji bo teşwîqkirina tedbîran ji bo Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê careke din serlêdanê bikin.

***Divê ji bo mafê hêviyê çi were kirin?***

Mafê hêviyê mafê girtiyan diyar dike ku ew girtî bawer bikin ku ew ê rojekê azadiya xwe bi dest bixin. Mixabin, niha li Tirkiyeyê qanûnek tune ye ku vî mafî çareser bike. Li gorî biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, rêziknameyên qanûnî yên der barê vî mafî de pêwîst in. Dadgehê diyar kir ku girtina heta hetayê nemirovane ye. Ji ber vê yekê, guhertinên li qanûna înfazê û avakirina mekanîzmayek lihevhatî ya bi mafê hêviyê re hewce ye.




Hevserokê Giştî yê Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz Serhat Çakmak diyar kir ku azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan garantiya pêvajoya aştiyê ye û got: “Pêwîst e hikûmet di vê mijarê de bêyî hesabên siyasî bike, divê gaveke wêrek bavêje.”



## Serhat Çakmak kî ye?

Sala 1988an li navçeya Hîzana Bedlîsê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li Hîzanê qedandiye. Sala 2012an ji Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Marmarayê mezûn dibe û sala 2014an ew tevlî Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) dibe. Niha wek hevserokê giştî yê OHDê kar dike û di heman endamê demê de jî li Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV) xebatên xwe dimeşîne.



Adar Jiyan

# Têkiliya muzîk û wêjeyê



Muzîk û wêje du rêzkarên (disîplînên) hunerî yên bingehîn in ku di tevahiya dîroka mirovahiyê de hem ji hev der dibin, hem hevdu temam dikin û hem jî li ser bingeha heman çandê dibin yek.

Herdu hêman jî li ser veguhastina hestan, hilberîna wateyê û ezmûna bedewkariyê disekinin. Ji ber vê yekê, her çendî ku ew destpêkê hebûna xwe li ser rêbazên cuda yên derbirînê ava bikin jî, di veguherîna civakî û bîra çandî de bi hev ve girêdayî ne û bandoreke mezin li ser hişmendiya mirov dikin. Çawa ku wêje peyva wêjekar a devkî bi rêk û pêk dike, muzîk jî bi heman awayî deng û awaza hunermend bi rêk û pêk dike; belê herdu jî ezmûnekê pêk tînin û wê li guhdarîkirin û têgihiştinê dadigerînin.

**Muzîk û wêje di avakirina nasnameyên civakî û avakirina bîra kolektîf de amûrên bingehîn in. Di kevneşopiya dengbêjiya kurdan de, veguhastina melodîk a vegotinan rê dide forma wêjeyî û muzîkê**

Di vê gotarê de armanca me ew e ku em bingeha dîrokî ya têkiliya navbera wêje û muzîkê, aliyê wê yê bedewkarî û nasnameyî, bandora wê ya civakî û têkiliya wê ya kardariya çandî di çarçoveyeke akademîk de derpêş bikin. Rîtm/wezn, teql û ahenga hêmanên fermî yên wêjeyê ne ku rasterast bingehek avahîsaziyê bi muzîkê re datînin. Hêmanên wekî jimara kîte, hemtîp û rêzbendê di helbestê de bargir in ku bandora muzîkê zêde dikin. Ji ber vê sedemê, gelek teorîsyenên wêjeyê, helbestê wekî cureya wêjeyî ya herî nêzîkî muzîkê dibînin. Bo nimûne, Ezra Pound, pêşengê helbesta modernîst, bi gotina "Helbest û muzîk wateyê digihînin hev" bi awayekî aşkera vê girêdanê teqez dike. Bi heman awayî, di wêjeya Dîwanê de, pîvana/wezina erûzê li ser avahiyek rîtmîk a ku ji kevneşopiyên muzîkê yên erebî û farisî bandor wergirtiye hatiye avakirin. Ev yek nîşan dide ku wêje tenê nêzîkî muzîkê nabe bi heman awayî vaca (mantiqa) wê ya bedewiyê jî diguherîne.

Bingeha têkiliya navbera muzîk û wêjeyê xwe dispêre serdema çanda devkî. Di serdema berî ku civakên dîrokî şêweyên nivîskî bi pêş nexistine de, mît, vegotin, destanên qehremanî, nivîs û rîtuelên/rêçikên olî pirî caran bi hev dihatin veguhastin. Ev jî nîşan dide ku herdu huner destpêkê ji hev cuda nebûne; her wiha bi hev re bi pêş ve çûne. Di çanda yewnan a kevnar de, pêşkêşkirina berhemên destanî yên Homer, wek Îlyada û Odesa, ji hêla hozanan (stranbêjan) ve delîlên pêkanîna muzîkî ya vegotina wêjeyî ye. Bi heman awayî, stranbêjên ku li deştên Asyaya Navîn bi kopuzê re destan gotine û bi awayekî berbiçav kevneşopiya devkî û muzîk bi hev re nîşan dane. Nimûneyên wiha nîşan didin ku wêje û muzîk ne tenê du rêzkarên ku li seranserê dîrokê piştgiriyê didin hev; şert û mercên hebûna hevdu jî dişêwînin.

Bandora muzîkê li ser wêjeyê ne tenê di asta fermî de ye. Ramana muzîkî, di warê afirandina reng, hest û keşûbayê (atmosferê) de derfetên derbirînê yên wêjeyê berfireh dike. Herikîna melodîk a nivîsekê- bi gotineke din, dirêjahiya hevokan, dubarekirina dengan û rîtma dengvedanê ya zimên- bi xwîneran re hesteke muzîkî diafirîne. Ji ber vê yekê, beşek girîng a şêwaza wêjeyî xwe dispêre şiyana nivîskar ku wekî "bestekarê zimannasiyê" tê pênasekirin. Lêkolînên heyî yên zanista hişî aşkera dikin ku muzîk û ziman ji hêla binesaziyên demarî yên hevgirtî ve di mêjiyê mirov de têne hilberandin. Hem muzîk û hem jî wêje bandorên wekhev li ser rîtm/teql, naskirina şêwazan, rêkxistina hestan û pêvajoyên bîranînê çêdikin. Ji ber vê yekê, pêşveçûna ramana muzîkî bandorek erênî li ser derbirîna zimanî û xwendin û nivîsandina wêjeyî ya takekes dike.

Hevkariya deng û wateyê di hişê mirov de şopeke bîranînê ya xurttir dihêle. Ev yek vê rastiyê destnîşan dike ku avahiyên ahengdar/rîtmîk û newadar/melodîk bi hêsanî têne bikaranîn. Lorik, helbestên zarokan, an jî lawijên ku ji zarokan re têne xwendin bi rêya muzîk û wêjeyê piştgiriya pêşveçûna têgihiştinê dikin. Bingeha têgihiştinî ya hevpar a muzîk û wêjeyê nîşan dide ku hişê mirovan bi awayekî xwezayî herdu hêmanan (huneran) di navbera xwe de ava dike. Muzîk û wêje di avakirina nasnameyên civakî û avakirina bîra kolektîf (pevrayî) de amûrên bingehîn in. Sirûdên neteweyî, şînên melodîk, destanên kevneşopî û stranên gelêrî, dîrok, nirx û hestên civakekê ji nifşekê bo nifşeke din vediguhêzin. Bo nimûne, di kevneşopiya dengbêjiya kurdî de, veguhastina melodîk a vegotinan de parastina bîra kolektîf hem rê dide forma wêjeyî û hem jî forma muzîkê. Bi heman awayî, kevneşopiya aşiqên (hozanên) Anatolyayê ku wekî bingeheke çandî tê zanîn ku gotin û newa bi hev re hilberandine, hem ezmûnên dîrokî û hem jî hestên takekesî pênase dike.

Di demên nûjen de, têkiliya navbera wêje û muzîkê pirî caran bûye dengê tevgerên civakî. Muzîka protestoyê ya sedsala 20an kevneşopiyek xurt a devkî afirandiye ku ji hêla wêjeyê ve hatiye agahdarkirin; roman, helbest û stranan zimanekî hevpar ê berxwedana kolektîf ava kiriye. Ev rola çalak a herdu formên hunerî xwe di veguherînên civakî de jî dide der.

Têkiliya navbera muzîk û wêjeyê û îro pir aloztir û pirqatîtir bûye. Ji romanan bigire heta operayan, ji helbestan bigire heta senfoniyan, ji nivîsên wêjeyî bigire heta gotinên stranan û gelek cureyên din bi hev re têkildar in. Bi taybetî cureyên wekî opera, bale û oratoryo, ji nû ve xwe dispêrin şîrovekirina muzîkî ya metnên wêjeyî. Guncandin û lêanînên operayî ya berhemên Shakespeare mînakek klasîk a têkiliya navbera wêjeya cîhanî û dîroka muzîkê de ye. Bi heman awayî, muzîkalên ku ji berhemên Vîctor Hugo hatine edilandin an jî besteyên senfonîk ên rûsî yên ku ji helbestên Pûşkîn best û sirûş (îlham) wergirtine, girîngiya wêjeyê wekî çavkaniyek afirandina muzîkê nîşan didin.

Têkiliya navbera muzîk û wêjeyê di serdema dîjîtal de şêweyên nû wergirtiye. Pirtûkên dengî, vegotinên rîtmîk, performansên helbestên piralî, pratîkên çîrokbêjiya dîjîtal û naveroka muzîkî ya wêjeyî ku li ser medyaya civakî belav dibin, têkiliya navbera her du huneran bêtir derdixe pêş. Navnîşa (damika) stranên têkildarî mijara wêjeyî, li ser platformên weşana muzîkê dihêle ku nivîs li gel muzîkê were guhdarîkirin. Hin nivîskarên hemdem ji bo romanên xwe damikên stranên taybet diafirînin û di navbera xwîner û nivîsê de pireke hestyar ava dikin. Ev yek, ezmûna xwendinê tenê li ezmûneke nasnameyî danagerîne, li ezmûneke hestyarî jî dadigerîne.

Têkiliya navbera muzîk û wêjeyê, qadeke berfireh û çalak e ku li gel têgihîştina têkiliya navbera herdu huneran, lêkolînên çandî û zanyariyên civakî jî pêşkêş dike. Îro teknolojiyê sînorê herdu formên hunerî berfirehtir kiriye; pratîkên xerckirina hevpar afirandiye û têkiliya navbera herdu disîplînan (rêzkaran) kûrtir kiriye. Gava ku nivîskarek li muzîkê guhdarî dike û dinivîse, heman gavê rengên hestyar ên pêvajoya afirîner jî destnîşan dike. Berovajiyê wê, bestekar ji metnên wêjeyî best û peyamekê werdigire da ku vegotinên newadar biafirîne û di navbera herdu rêzkaran (dîsîplînan) de herikîneke azad bi pêş bixe.

Muzîk û wêje du warên girîng ên derbirînê ne ku bergeha afirîner a mirovan pêk tînin. Muzîk wekî rêyek afirîner a li hemberî tundiya hestyarî, herikîna rîtmîk û cihêrengiya tembûrê pêşkêş dike; wêje jî rêyek afirîner ji bo derbirîna devkî, xeyal û kûrahiya rewşenbîrî pêşkêş dike. Yekîtiya herdu huneran ji bo hem hunermend û hem jî temaşevanan cîhanek hestyarî ya dewlemendtir ava dike.

Mîna Acar


# Bila rik nebe qedera me ya dawî

Dilê me li dû hespeke kulek li erdê kaş dibe. Nayê dîtin di jiyana rastîn de, lê dema em çîk disekinin û li nav gerîna gerdûnê, bi şaşwazî li rû û dilên mirovan ên cemidî dinêrin, em dibînin. Em dibînin, lê em ji neçarî her carê bêdeng dimînin. Pir caran kerba wê cemidandinê di serê me de diteqînin, pê li me dikin û derbas dibin. Piştre yên sûcdar dîsa em in. Ji ber ku wan wisa cila xwe ji avê derxistiye, kesî jî ew danekişandiye da ku rik ji wan biweşe di dewsê de zanebûn di nav dilê wan de şên bibe. Em her tim şaşwazî li dilê xwe yê li dû hespeke kulek kaş dibe temaşe dikin; çi ji destê me tê, yan jî wê çi ji destê me bê ji vir û pê ve...

Mirov di serî de divê dakeve birînên zarokatiyê, li gor hîmên psîkoanalîzê. Freud jî sax bûya, bawer dikim wê nikarîbûya ji nav zarokatiya me û vî dilê me derketa. Em serê xwe bêhtir bi hev diêşînin, ka em li benda hevdu bimînin bê ji me kî wê xeletiyekê bike, ez ê bibim a herî baş tevî dilê xwe yê tije rik. Heger em xwe ji vê lîstika serdestiyê azad nekin, em civakekê ava dikin ku tê de serma û qeşaya dilên mirovan qedera herî pêşîn e.

Lê divê em vegerin dilê xwe; di dilê xwe de, jiyaneke em dikaribin bexçeyekî biçînin û bixemilînin, da ku em kesên din jî lê zêde bikin. Piştre em dakevin civaka xwe, wan jî xweşik bikin ji mejî dest pê bikin û belav bikin. Em xwe jî tune nekin di nav rika dilê xwe yê cemidî de, da ku em civaka welatê xwe dewlemend ava bikin. Divê em matmayî nemînin, li nêrîna dilê xwe yê li dû hespa kulek kaş dibe bi wir ve asê nemîne. Em xwe dakişînin û dev ji hevdu berdin; em berî bidin bîra xwe, bila bîra me li dû me nemîne, bila were pêşiya rika me.

Bila rik nebe qedera me ya dawî; bila bîr û zanebûna me, wê cîhana şikestî ya ku em tê de ne, ji nû ve ava bike. Pêdiviya me bi dilê ku ji qeşayê rizgar bûye heye, da ku ew êş û azar ji me re bibe wijdanekî xurt.



# Çareserî bi naskirina îradeya aştiyê pêkan e

Di konferansa li Stenbolê de mijarên pir girîng hatin rojevê. Eleqedariya derve zêde bû lê mixabin li Tirkiyê desthilat û muxalefetê baş neşopand. Tevgerên çepgir jî di nîqaşa li ser sosyalîzmê de xitimîn. Nûbûnek divê




Zinar Ronî

Di demekê de ku hewl tê dayîn Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk derbasî merhaleya duyemîn bibe, li Stenbolê konferanseke girîng pêk hat. Konferansa ku ji aliyê Partiya DEMê ve hate organîzekirin malovaniya gelek kesên navdar ên cîhanê kir. Ji Efrîkaya Başûr heya Îrlandayê, ji Meksîkayê heya Îspanyayê bi dehan akademîsyen, filozof, siyasetmedar, parêzer, aktîvîstên aştiyê, xwediyên Xelata Aştî ya Nobelê tevlî konferansê bûn. Her wiha gelek kesên ku nekarîn bi fizîkî tevlî konferansê bibin jî bi rêya teknîkê bi peyamên bidîmen şandin. Peyamên Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan, Fîgen Yuksekdag û Selahattîn Demîrtaş ên nivîskî hatin xwendin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di peyama xwe de bal kişand ser girîngiya pêvajoya heyî û sosyalîzma civaka demokratîk. Birêz Abdullah Ocalan ji aliyekî ve bangewazî li rayedarên dewletê kir ku 'Zagonên Hemwelatîbûna Azad, Zagona Aştî û Civaka Demokratîk, Zagonên Azadiyê' derxe û pêşiya entegrasyona demokratîk vebike. Ji aliyê din ve jî bangewazî li têkoşerên dijpergalê kir û wiha got: "Divê dîroka bindestan bi perspektîfa komunan a ku pêkhateyeke xweparastinê ye ku ji çînê pêştir e, bê lêkolînkirin. Ji bo vê yekê perspektîfeke dîrokî hewce dike ku êlên destpêkê wekî destpêka komunan dibîne û digihîje çîna ku em îro jê re dibêjin proleterya yan jî digihîje hemû gelên bindest."

Konferans bi giştî li ser paradîgma û azadiya Rêberê Gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan dewam kir. Hema bêje hemû axaftvanan girîngiya paradîgmaya birêz Abdullah Ocalan anî ziman. Fîlozofê marksîst ku ji Meksîkayê beşdarî konferansê bûbû, John Halloway, ev paradîgma wekî 'şewqeke ku di nav tarîtiyê de dibiriqe' pênase kir. Tenê ne ji aliyê fikrî, ji aliyê rêxistin û civakî ve jî birêz Abdulah Ocalan wekî alternatîfeke nû derdikeve pêş. Nivîskar û parêzer Orhan Gazî Ertekîn jî girîngiya tevgera kurdî bi hevrûkirina dema niha û ya 1960-1970yî anî ziman. Demên 1960î demên serhildanên ciwanan bû. Slogana sereke jî wiha bû: ''Cîhaneke din gengaz e!'' Piştî hilweşîna sovyetan û belavbûna Yugoslavyayê kelecan û hêviya guhertina pergala heyî bi piranî çilmisî. Jixwe Fukuyama jî ev rewş wekî 'dawiya dîrokê' bi nav kir. Lê Ertekîn bi gelek argumanan diyar kir ku tevgera kurdî ev rewş guherandiye. Li gorî wî dînamîzma ku kurdan ava kiriye û veguherandiye guhertineke bipergalî, careke din hêvî û kelecana guhertinê şîn kiriye. Dîroknasê misirî Mohamed Refaat, rewşa kurdan a heyî ji aliyê dîrokî ve nirxand. Ango kurd tenê ne roja me îro, li tevahiya dîrokê bûne xwedî risteke girîng.

Yek ji mêvanên qedirbilind jî Norman Peach bû. Norman Peach, anî ziman ku wî sala 1996an bi Abdullah Ocalan re hevdîtin kiriye û hêj wê demê ferq kiriye ku birêz Abdullah Ocalan dev ji staretejiya têkoşîna çekdarî û avakirina dewletek cuda berdaye. Lê ji ber ku nêzîkatiyeke erênî nehatiye nîşandan, ev guhertin heya roja me hê jî didome. Norman Peach di çareserkirina pirsgirêka kurdî de rola Almanya jî anî ziman. Almanya ji 1993yan ve PKKê wekî rêxistineke terorîst dibîne. Norman Peach diyar kir ku ev biryar divê rabe, ji bo rabe jî ew ê têkoşîneke xurttir bimeşînin.

Akademîsyenê Zanîngeha Xweser a Barselonayê Louîs Lemkow hemû axaftina xwe li ser girîngiya civakbûna aşitiyê kir. Lemkow gelek xizmên xwe di komkujiya cihûyan de wenda kirine. Tenê li kampa Austcwîtzê 21 kes ji malbata wî hatine qetilkirin. Lê Lemkow rewşa îro ya Îsraîlê nirxand û hewldanên Îsraîlê 'wekî qetlîam' bi nav kir. Wî bangewazî kir ku divê mirov li hemberî êrişên Îsraîlê bisekinin. Slogana wî wiha bû: "Divê li ti cihî komkujî pêk neyên." Ji bo pêşiya komkujiyan were girtin, hewcedarî bi bîreke xurt heye, encax bîreke xurt dikare behsa bûyerên kirêt bike.

Di axaftinan de diyar bû ku çareserkirina pirsgirêkên wekî pirsgirêka kurdî zehmet e. Zehmetiya wê jî ew e ku divê her du alî îradeya aştiyê qebûl bikin. Ligor Zulaîka, parlamenterê baskî, anî ziman ku wan pêvajoyeke yekalî daye destpêkirin lê piştre hatiye fêmkirin ku yekalî nameşe. Li Îrlanda û Efrîkaya Başûr jî pirsgirêk bi heman rengî hatiye nirxandin. Hê jî li Îspanyayê pêvajo bi dawî nebûye, hê jî li Îrlandayê pêwîstiyên 'Peymana Îna Bixêr' bi cih nehatine. Lê li van deran peymanên aştiyê hene. Jixwe ji cerebeyên deverên cuda yên cîhanê tê fêmkirin ku berî her tiştî hewcedarî bi peymaneke aştiyê heye. Peymana aştiyê divê zemîna muzakereyan û guhertina zagonan bide avakirin. Her tişt bi peymana aşitiyê çareser nabe, lê ji bo destpêkeke nû hewcedariyek e.

Li Tirkiyeyê cara yekemîn konferanseke bi vî rengî pêk hat. Eleqedariya derve zêde bû lê mixabin di nav Tirkiyê de ji aliyê desthilat û muxalefetê ve baş nehat şopandin. Tevger û partiyên çepgir jî di nîqaşa li ser sosyalîzmê de xitimîn. Hem beşdarî konferansê nebûn hem jî ji derve ve ji aliyê neyînî ve konferans xistin mijara nîqaşê. Konferansê ev hewcedarî nîşan da ku li Tirkiyeyê pêdivî bi guhertineke mezin a çepgir jî heye. Çepgiriya niha di qalikê xwe de maye û bernameyeke çareseriyê jî pêşniyarî civakê nake. Tenê îro tişta dike ew e, li hemberî ramanên birêz Abdullah Ocalan mixalefetê dike. Lê ew jî êdî hew fêde dike. Nîqaşên naxweyî baş in, lê heke bi bertekî bin encamên neyînî derdikevin holê. Tevger û partiyên sosyalîst heke dixwazin ji têkoşîna gelên bindest re bibin bersiv, hewce ye xwe li gorî demê nûjen bikin.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Gefên li dijî yekîtiya gelan

Siyaseta dewleta tirk a li Sûriyeyê bi tamamî li ser dijberiya kurdan hatiye avakirin. Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di çarçoveya vê armancê de di nav şerekî taybet de ye. Lê di rastiyê de armanc ew e ku kurdan ji axa wan derxîne û xweseriya wan bi temamî asteng bike.

Ji sala 2016an ve, bi êrişên cuda, Tirkiye bi awayekî hovane herêmên wekî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin, bi sedan kurd kuştin û bi milyonan jî bûn koçber. Niha, kanûna 2025'an, serokkomarê AKP'yî Erdogan û wezîrên wî yên sondxwarî yên dijmînê gelê kurd dîsa li dijî kurdan dest bi gefan kirin.

Dibêjin; "Eger entegrasyon neyê pêkanîn, em ê bi hêza leşkerî tevbigerin.'' Ev ne tenê gotin e; ev nîşaneya planeke taybet e ku bi HTŞ'ê re hatiye kirin. Jixwe tê zanîn ku Heyet Terîr El Şam (HTŞ) ji destpêkê ve weke hevkarê Tirkiyeyê tê dîtin û di pozîsyonek dij-kurd de ye. Tirkiye, bi piştgiriya xwe ya ji bo hikûmeta demkî ya HTŞê, dixwaze herêmê di bin kontrola xwe ya nerasterast de bigire, bi awayekî ku HSD'ê wekî "terorîst" nîşan bide. Ev siyaseta genosîdî ye, ku mafên kurdan û pêkhateyên herêmê tune dike û herêmê veguherîne koloniya tirkan.

Di vê çarçoveyê de, peyamên tund ên Tirkiyeyê li dijî Rêveberiya Xweser û HSDê, di pêvajoya aştî û civaka demokratîk de, ranestiyane; ew stratejiya hovane ye ku demokrasiyê sabote bike. Tirkiye dixwaze herêmê di bin desthilatdariya navendî ya HTŞ'ê de bigire, ku ew jî bi awayekî faşîstî li dijî xweseriyê ye. Ev tehtîd, ne tenê li dijî kurdan, lê li dijî hemû Sûriyeyê ye. Ew dixwaze li Sûriyeyê pêvajoya hevdîtinan hilweşîne û şerê navxweyî bidomîne, da ku Tirkiye wekî "parêzvan" xuya bike. Lê rastî ev e: Tirkiye ne parêzvan e, ew dagirker e ku bi destê HTŞê dixwaze hegemonya xwe li herêmê xurttir bike.

Hikûmeta demkî ya HTŞê, ku ji aliyê Tirkiyeyê ve tê piştgirîkirin, siyaseta xwe ya li hemberî Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wekî "entegrasyon" nîşan dide, lê di rastiyê de ev tunekirina xweseriyê ye. HTŞ, ku berê wekî aliyekî El-Qaîdayê dihat nasîn, niha bi awayekî faşîstî dixwaze hemû hêzên leşkerî û sîvîl ên Rêveberiya Xweser di bin desthilatdariya navendî ya Şamê de bigire, bêyî ku mafên kurdan misoger bike. Ev ne "aştî" ye; ev dagirkeriyeke din e, ku bi piştgiriya Tirkiyeyê tê kirin. HTŞ, bi gotinên xwe yên dijî mezheb, pêkhate û civakên cuda, dixwaze kurdan li herêmê bi tamamî bê bandor bike. Bi vî awayî armanc dike ku hebûna xwe ya li herêmên Rêveberiya Xweser xurttir bike û ger bikaribe yekser herêmê têxe bin kontrola xwe.

Siyaseta HTŞ'ê, bi awayekî hovane, Rêveberiya Xweser wekî têkoşîna li dijî yekîtiya Sûriyeyê nîşan dide, lê ew bixwe yekîtiyê tune dike. Hevkariya wê ya bi Tirkiyeyê re ne tenê li ser dijberiya kurdan hatiye avakirin. Her wiha ji bo avakirina desthilatek yek al, yek ziman, yek ol û yek neteweyê hatiye avakirin. Ev zihniyeta ku xwe dispêre hişmendiya hevalbendê wê Tirkiyeyê bi temamî li dijî pirrengiya gelên Sûriyeyê ye. Ev siyaseta faşîst e, ku dixwaze modela demokratîk a Rojava hilweşîne.

Peymana 10ê adarê ya 2025an, ku di navbera HTŞ'ê û HSD'ê de hate îmzekirin, di serî de wekî hêviyê hate dîtin. Di rastiyê de ger ev peyman bi hemû xalên xwe biketa meriyetê wê ji bo siberoja Sûriyeyê bibûya çavkaniyek xurt. Lê niha, kanûna 2025an, ji ber siyaseta qirêj astengiyên hikûmeta demkî ya HTŞê ev peyman wekî kaxezekî vala maye.

Em dikarin sedemên nebicihanîna peymana 10ê adarê bi çend gotina wiha bi rêz bikin: HTŞ, bi piştgiriya Tirkiyeyê, dixwaze entegrasyonê bi şertên xwe yên weke bêyî xweserî, bêyî mafên demokratîk û naskirina îradeya pêkhateyên herêmê têxe meriyetê. Ji ber van daxwazên ku bi her awayî dûrî rastiya herêmê û têkoşîna ku hatiye dayîn in, hevdîtin di çarçoveya pêkanîna xalên peymanê de jî hatine rawestandin. Rêveberiya Xweser rexne dike ku hikûmeta demkî ne tenê astengiyan li pêşiya pêkanîna peymanê ava dike, di heman demê de xalên di peymanê de li gorî berjewendiyên deshilata xwe formûle dike. Derengxistina pêkanîna peymana ku herdu aliyan li ser li hev kiriye rê li ber alozî û astengiyên cuda vedike.

Diyar e ku di mijara derengxistina pêkanîna xalên peymanê de rola dewleta tirk jî heye. Bi taybet wezîrê karên derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan û dîplomatên din tirk di vê serdemê de rêya Enqereyê ji bîr kirine her roj li Şamê ne da ku di vê mijarê de ya xwe pêk bînin.

Astengiyên ku HTŞ derdixe, ne tenê teknîkî ne; ew siyasî û leşkerî ne jî. Wekî alîkarê sereke, bi tehtîdên xwe yên "heta dawiya kanûnê yan entegrasyon, yan jî şer", pêvajoyê sabote dike. Ev ne pêkan e; ev xiyanet e, armanc ew e ku HSDê bi temamî hilweşîne û herêmê bide destê hevkarên xwe yên li dijî yekîtî û wekheviya pêkhateyan herêmê.

Di vê pêvajoya aştî û civaka demokratîk de, dewleta tirk çima li dijî Rêveberiya Xweser û HSDê peyamên tund dide? Bersiv diyar e. Ji ber ku ew dixwaze demokrasiyê têk bibe! Tirkiye, bi siyaseta xwe ya faşîst, nabêje "aştî û wekhevî" hîn bi zîhniyeta serdest û dagirker bi tevdigere. Peyamên wekî "entegrasyon an şer", ne tenê tehtîd in; ew planên leşkerî ne ku bi HTŞê re hatine danîn. Ev peyam, di dema ku Rêveberiya Xweser ji bo muzakereyan bang dike, ji bo wê yekê ye da ku hêviyên aştiyê bi tamamî tune bibin û şerê navxweyî bidomînin. Tirkiye her çendî dibêje "ez li dijî perçekirina Sûriyeyê me" lê di rastiyê de ev siyaseta Tirkiyeyê Sûriyeyê ber bi perçebûnek mezin ve dibe.

Bi giştî, siyaseta Tirkiyeyê ya li Sûriyeyê û dijberiya wê ya li dijî Rêveberiya Xweser, divê wekî emperyalîzma faşîst were nirxandin. Ev siyaseta ku ne tenê kurdan, hemû gelên Sûriyeyê di bin metirsiyê de dihêle bi xwe re hêviyê ava nake. Tirkiye, bi piştgiriya HTŞê dixwaze herêmê veguherîne koloniyeke xwe, mafên kurdan tune bike û modela demokratîk a Rojava hilweşîne. Ev ne "ewlehî" ye; ev hovîtî ye, ku bi milyonan mirov di bin metirsiya mirinê de dihêle. HTŞ, wekî alîkarê tirk, ne wek "hikûmeta demkî" tevdigere; ew weke rêxistinekê ye ku îradeya xwe teslîmî Tirkiyeyê kiriye ku bi awayekî hovane xweseriyê qedexe dike.

Ev siyaseta faşîst divê bi tundî were rexnekirin û li dijî wê têkoşîn were dayîn. Rojava ne tenê herêma kurdan e; ew hêviya demokrasiyê ye. Gelên Sûriyeyê, li dijî van hewildanên ku îradeya gel tine dihesibînin, li gel HSDê ala têkoşîn û azadiyê rakin. Divê were zanîn ku aştî bêyî edalet û qebûlkirina wekheviyê ne pêkan e. Edaleta herî mezin ew e ku ji hemû pêkhateyên li herêmê re di çarçoveya bawerî, nasname û çandî de werin qebûlkirin û parastin. Ger ev pêk bê em dikarin bêjin rojên geş û xweş li pêşiya Sûriyeyê ne.



Remezan Olçen

# Şiyar be!

Di roja me ya îro de yek ji mijarên ku herî zêde tê bilêvkirin rizîna civakî, pûçbûna têkiliyan û li dijî vê rewşê girîngiya avakirina civaka exlaqî û polîtîk e. Şerê taybet û qirêjî civak ji hev de xistiye. Bûye ku civak û malbat weke cinawiran zarok û ciwanên xwe dixwin! Di van salên dawî de li bakurê Kurdistanê jî di encama şerê qirêj de ev karên kirêt zêde bûne. Bazirganên van qirêjiyan êrişî hemû nirxan dikin. Li dijî vê jî heke bi serwextî û zanebûn têkoşînek neyê meşandin li ser navê paşerojê wê ji civaka me re jî tiştek nemîne; ne xeyal û ne jî armancek...

Em xwe reşbîn nekin. Em bizanin ku ev rewş li çar aliyê cîhanê kêm zêde weke hev e. Lê lêv beriya diran e û em ê li halê xwe binêrin. Em ê ji halê xwe re çareyek bibînin. Em ê ji xwe dest pê bikin. Dema me birînên xwe kewandin, ev wê ji derdora me re jî bibe mînak. Ji bo ku em bikaribin vê jî bikin lazim e em sazûmaniya xwe, rêxistiniya xwe xurt bikin. Ji ber ku xelasî, rizgarî bi serê xwe nînin.

Civaka kurd a ku bi nirxên xwe re dilsoz e, çi bû sedem ku salên dawîn ewqas qirêjî ket navê? Kîjan şibak û derî vekirî hatin hiştin ku ev qirêjî xwe xist nav mala kurdan? Pirsên muhîm in û tevî malbat û saziyên xwe, tevî pêşengên xwe divê em li bersivan bigerin. Erê şerekî bêrehm û qirêj li hemberî me hat meşandin. Lê jixwe ya muhîm ew e ku di demên wisa de mirov bikaribe xwe ji qirêjiyan biparêze. Çi bûn sedem ku me nekarî zarok û ciwanên xwe biparêzin.

Terza jiyanê û terza danîna têkiliya bi hev re guheriye. Bajar jixwe weke mekanên kaotîk ji xwe re rîtm û lezek çêkiriye, bi bêrehmî şevê dikin roj û rojê dikin şev. Betalî û xizanî pê re kêmbûna halxweşiyek bidirûstî, nebûna sazûmaniyeke xurt a exlaqî û polîtîk muqavemeta civakî ya li hemberî van qirêjiyan jî kêm dike. Emrê bikaranîna tiryak û heşîşê bi raporan sabît bûye ku daketiye heta 8-9 saliyan. Pê re zêdebûna fihûşê ye. Dewlet ne bi tenê bi tank û topên xwe bi van qirêjiyên xist nav civakê jî şerekî bêeman meşand û hîn jî dimeşîne. Memûr, esker, polîsên dewletê li Kurdistanê serkêşiya vî şerê qirêj dikin. Sed mixabin ku dema vê dikin, yên ji wan re xizmetkariyê dikin jî hene. Xwedêgiravî ferdên ji nav mala kurdî ne lê ew bixwe dibin belavkarê wê tiryakê û ew bixwe dibin sedem ku esker û polîs û memûr wisa bi rehetî fihûşê bikin. Heta ew jî bi wan re heman karî dikin.

Niha li bakurê Kurdistanê bi Platformên Şiyar Be li hemberî vî şerê qirêj têkoşîneke mezin û birêxistinî dest pê kiriye. Di dewra yekê de xebatên wan xuya ye ku li ser teşhîrkirinê û serwextkirinê ne. Di lingên pêş de bi çalakiyên çand û hunerî, xebatên perwerdeyî, xebatên werzîş û sporê wê qadên paqij û alternatîf ên ku zarok û ciwan bikaribin xwe tê de îfade bikin û bi hev re têkiliyên paqij ava bikin wê bi pêş bixin. Îcar li vê derê karekî mezin dikeve ser milê malbatan, dikeve ser milê der û cîranan ku têkiliyên xwe ji nû ve tanzîm û xurt bikin.

Ev aliyek meselê, aliyê din jî avakirina ekonomiyeke paqij e. Ji bo vê jî lazim e civak tevlî pergala hilberînê bibe û bikaribe debara xwe bike. Yek ji lingên esasî yê meselê jî ev e. Li bajaran rêjeya betaliyê nîşan dide ku karekî zehmet e lê heke ev betalî ji holê neyê rakirin jî wê ev zarok û ciwan tim di hedefa bazirganên jiyankuj de bin. Ji bo wê jî rêxistiniyên demokratîk bi rêya şaredariyan bi avakirina qadên nû yên kar, divê hedef bikin ku vê betaliyê jî ji holê rakin. Encax bi vî awayî em ê bikaribin derî û şibakên xwe zexim bikin û mala kurdî biparêzin.




Civaka kurd a ku bi nirxên xwe re dilsoz e, çi bû sedem ku salên dawîn ewqas qirêjî ket navê? Kîjan şibak û derî vekirî hatin hiştin ku ev qirêjî xwe xist nav mala kurdan? Pirsên muhîm in û tevî malbat û saziyên xwe, tevî pêşengên xwe divê em li bersivan bigerin



Medenî Ferho

# Şeva Midyadê

Apê Îsmet digot; "Hin bajar hene weke bajarên her demê têne binavkirin. Yek Mêrdîn, yê din jî Stenbol e. Di her du bajaran de delalî û zerafetek nerm û hişk heye. Delalî û zerafeta Stenbolê meşrebsivik e, ya Mêrdînê meşrebgiran e.''

Dîsa jî Stenbol bajarê xewn û weyalan e, Mêrdîn bajarê helbestên jikevir e. Stenbol xwe nû dike, Mêrdîn her dem yek e, yanî kevin û nû weke hev in. Dema mirov, pencereyên mêjiyê xwe ji her du bajaran re vedike; Stenbol bi mij û moran xuya dibe, Mêrdîn ava zemr û zelal e. Estetîka Stenbolê diguhere, estetîka Mêrdînê naguhere. Helbestvanên ku li ser Stenbolê helbest nivîsîne, piştî nifşekî wê tonaj, akord, muzîk û ahenga gotinên wan werin guhertin, melodiyên cuda derkevin holê; Mêrdîn ne wisa ye, bi helbest û qesîdeyên pêxember Manî, bi helbest û qesîdeyên Siltan Şêxmûs, bi ahêng û kûlkesera Zembîlfiroş dijî û naguhere. Balkêş e, li her du bajaran jî mirov tên guhertin, lê di vê guhertinê de li Stenbolê hestên estetîk têk diçin, yan jî diguherin; li Mêrdînê estetîk û hafizeya kevin ligel hev dijîn. Kevirên li Mêrdînê, ji bo demekê destûrê didin heyecana mirovan, lê destûrê nadin guhertina estetîk û hafizeya mirovan.

Cudatiyeke din jî ew e ku pirsgirêkên Stenbolê bi gotinan çareser nabin, pirsgirêkên li Mêrdînê bi gotinan çareser dibin. Cudatiya sêyemîn, kevokên her du bajaran e, kevokên Stenbolê tenê dixwin û yek rengî dijîn, ji exlaqê kedê dûr in û konformîzma bê ayîn dijîn; yanî destên xwe li ber mirovan vedikin û evîndarên kolan û meydanan e. Kevokên Mêrdînê helbestî dijîn, hemû rengên wêjeyê, roman, çîrok, helbest, bîranîn bi wan re hene; ji bo wê jî, nav li wan hatine kirin. Belkî hunerê tiyatro ji wan nayê, lê dikarin di "baxçeyên zarokan" de bibin artîst. Kevokên Mêrdînê û hez ji kolanan nakin.

Min li ser gotinên apê Îsmet, ez derketim ger û geşta helbestên li ser her du bajaran. Dengê gotinan di guhên min de olan vedidan û di despêkê de ez rastî gotinên Orhan Velî Kanik hatim, digot; ''Li Stenbolê guhdarî dikim çavên min girtî / Pêşî bayekî nermik tê/ Hêdî hêdî dihejin pelên li daran / Li dûriya hey dûr dengê zengilê avfiroşan bêrawestan / Li Stenbolê guhdarî dikim, çavên min girtî"

Piştre rastî gotinên Mûrathan Mûngan hatim, wek ku ji berdêla helbestvanên cîhanê ve biaxive û destûrê nede, ku kesek gotinek bibêje, digot; "Helbesta kevir û evînê. "Kin û kurt navê Mêrdînê diqîriya. Ji xwe Manî Pêxember jî digot; 'Li vê axê fikra baş, gotina baş û karê baş heye. Roj wek her rojê, weke roja bi heman comerdiyê hiltê.' Ji bo êzdahî, rojê sê danan, li çavên rojê dinêrin û dibêjin, 'Roj li me hiltê bi xêrê, roj li me diçe ava bi xêrê!'"

Sal 1966, ji nişka ve rengê ezmanê Stenbolê û kolanên wê hatin guhertin. Rengê ezmanê Stenbolê her dem ji rengê deryayê re dibû yek û bextewarî dibarand. Wê salê, wek ku deynekî kefaretê hebe, rengê ezman hate guhertin, tarîtiyek metirsî kolanên Stenbolê dagirt. Em li 'Yurda Wezneciler'ê diman û dengê mirinê li dorê dihat guhên me.

Dengê dewsa lingên mirinê, yên SSên Turkeş bûn. Me, ev nav li wan kiribû, bi hatina wan re jiyan hatibû guhertin, kolan ne biewle bûn û dem jî giran bûbû. SSên Turkeş, li kolanan derdiketin nêçîra komunîstan. Ciwanên komunîst jî, çepgirên tirk û kurd bûn. Kurdbûn sûc bû, diviyabû werin tunekirin.

Yek ji wan kesan jî ez bûm, me Yekîtiya Xwendekarên Midyadê nû ava kiribû. Ez jî hevalên min jî ne komunîst bûn, em kurd bûm. Hevalên me yên li Enqereyê, Nezîr Şamikanli û hevalên wî jî ligel me bûn. Pîvanên SSên Turkeş jî balkêş bûn. Eger tu xwedî fikreke cuda bûyayî, di nav hevalên xwe de werî hezkirin û li pêş bî, te bawerî dabe her kesî û weke pêşeng derketibî pêş, dizanibî biaxivî, yanî xîtabeta te baş be, bixwe bawer bî, gelparêz bî, behsa edalet, hiqûq, maf û azadiyan bikî, rêxistiniyê bikî û herkesî li dora xwe bidî hev, tu armanca wan î û divê tu werî tunekirin. Me jî, di her axaftina xwe de behsa paşverûtiya senteza Ziya Gokalp dikir. Me behsa dagirkeriya Osmaniyan û tunekirina mîrektiyên kurdan, girtina medereseyên kurd, qedexekirina zimanê kurdî, cil û folklora kurdî dikir. Balkêş bû, ew xwediyê dewletê bûn, înakara gelê kurd, nasname û zimanê kurdan dikirin, digotin kurd tirkên çiyayî ne, gotina 'kurd' bi kart-kurtê bi kar dianîn; dema me behsa pêşbîniya kurdan a federasyon û konfederasyonên eşîrên kurdan dikir, dema me behsa hêza kurdan a di nav Osmaniyan de, behsa munecîm û muderrîsên kurdan; me behsa medreseyên Silêmaniyê, Cizîr, Qayda û Senendecê dikir; dema me behsa El Cizîrî, Babek, Alî Herîrî, Ehmedê Xanî, berhemên wekî Mem û Zîn, Rustemê Zal, Siyamend û Xecê, Ferhad û Şîrîn, Zembîlfiroş dikir; dema me behsa bajarên jeolojîk ên kurdan dikir, dema me digot, Seîdê Kurdî projeya zanîngeha Bedlîsê ya bi sê zimanan radetsî Siltan Abdulhemîd kir; dema me behsa pirtûkên muellîf, muderrîs û munecîmên kurd dikir û digot, pirtûkxaneyên Stenbolê bi berhemên wan dagirtî ne; dema me digot, hûn etraqk-î bî îdrak bûn, hûn bi Mevâhibi'l-Medeniyyeyên zanistên kurdan ferî şaristaniyê bûn û hûn niha difiroşin me; bi taybetî dema me behsa qirkirina gelê ermen, suryan, rûm û kurdan dianî ziman, ya staar dîn û har dibûn...

SSên Turkeş Stenbol kiribûne nav tarîtiyê. Hevalekî digot, 'Van rîtalan jiyan jî, mirin jî qirêjî kirine, mirov nema dikare bi hevalekî xwe re, li kehwexaneyekê, li pastaxaneyekê rûne, kahweyekê vexwe; mirov nema dikarin bê tirs li kolanan bigerin…" Çepgir bi pirranî bi parkeyên şîn digeriyan, SSên Turkeş jî, copiyên çeteyên mafiya bûn, şal-atqiyek reş li stûyê xwe dipêçan, rûyê xwe jî vedişartin… Hevalan navê wan kiribûne "marê reş".. Min digot, "marên reş" li cem me kurdan pîroz in, çima ew ev nav li wan kiriye? Lê şal-atqiyên reş bûbûne qaqilkê wan li cîhanê faşîzma Hîtler û Mussolînî hatibûn mehkûmkirin, lê Franco û Salazar li Ewropaya modern sîstemek faşîst ava kiribû… Turkeş jî, esker bû, Franco mînak girtibû, di navbera rêbazên Hîtler û Franco de rêyek taybet bi kar dianî. Çeteyên Turkeş ciwanên kurd dikirin armanc.

Ji xwe li ciwanan digeriyan. Kengî kîjan rojên kefaretê hene, di wan rojan de li kolanên Stenbolê bi taybetî, kolana di navbera Aksaray û zanîngeha Stenbolê de, li enîşka wê Sahaflar Çarşisi; qehwexane, dikan, rawestgehên otobêsan, taksî, sê danên rojê, bi şev û roj, ti deverek, ti carê bi ewle nebû. Parnoyaqên bi navê ulkucu hereket dikirin, wek ku marîhuana vexwaribin li kuştina komunîstan digeriyan. Komunîst jî du beş bûn, beşek ji wan alîgirên Moskowayê bûn, aliyê din jî kurdistanî bûn… Bi navê dewletê komunîst û kurd dikuştin.

Tişta balkêş ew bû ku, li çepgir, ulkucî û her ciwanî, bi mirûzekî tirş û tehl, tivêlek tarî, bi awirek beloq li her kesî dinêrin.

Me her du bask jî li malbata mirovahiyê hesab nedikirin. Yanî kesên bê sûc û guneh, nas û nenas dikuştin. Ew ji mirovbûnê dûr bûn.



# Ezberên tirkan, hestên kurdan

Encama polîtîkayên dehsalan a 'Li dîwar binêre, li dîmenê nenêre' ye. Pirtûk, televîzyon, dibistan, bîranînên xizmeta leşkerî, henek û mîzah... ev hemû di çavên tirkan de, kurd di çarçoveyek teng de dorpêç kirin. Kurd neçar man ku her tiştî li ser tirkan fêr bibin



Prof. Dr.
Abdulîllah Polat

Aliyek din ê vî wêneyê psîkolojîk ê giran newekheviyek kêm-axaftî lê bi heman rengî biryardar e: nehevsengiya zanîn û naskirinê. Ango, kî kê û çiqas dizane. Kurd ji roja ku ji dayik dibin ve bi tirkî dorpêçkirî ne. Zimanê perwerdehiyê tirkî ye; dîrok, erdnîgarî, wêje (hemû mijar tirkî ne û li ser tirkî) navendî ne. Televîzyon, radyo, sînema û çanda populer bi piranî tirkî hildiberînin; muzîka tirkî, mîzaha tirkî, rêzefîlmên TVyê yên tirkî û bultenên nûçeyan ên tirkî beşek navendî ya jiyana rojane ne.

Xizmeta leşkerî, polîs, dadgeh, nexweşxane, ofîsên qeydkirina sivîl (her têkiliyek bi dewletê re) bi tirkî tê kirin. Roja ku zarokek kurd dest bi dibistanê dike, divê ew ne tenê alfabeyek nû lê di heman demê de zimanek nû yê nasnameyê jî fêr bibe. Sirûda neteweyî ya tirkî, ala tirk, qehremanên tirk, kevneşopiyên dewleta tirk û cilên tirkî... ev hemû di hişê zarokê kurd de cihekî navendî digirin. Kurdek mezin dibe û li ser dewleta tirk, zimanê tirkî, vegotina dîrokî ya tirkî, hesasiyetên tirkî, tirs û serbilindiya tirkî fêr dibe. Piraniya tirkan der barê kurdan de çi dizanin? Çend zaravayên kurdî hene, rêzimana wan çawa dixebite; kevneşopiya dengbêjiyê; dîroka 7 hezar salî ya Colemêrgê; çîrokên Botan, Mêrdîn, Dêrsim û Licê; Mûsa Anter, Celadet Bedirxan, Feqî Huseyin Sagniç, Mehmed Uzun, Ahmet Kaya. Pirrengiya gelê kurd: şafî, henîfî, êzidî, elewî... çend kes bi rastî van hemûyan dizanin? Ne tesaduf e ku tirkekî ku li vî welatî ji dayik bûye û mezin bûye, tirkekî ku li zanîngehekê xwendiye, heta bûye akademîsyen, hîn jî bi gotinên 'ev ew kes in ku ji çiyayan daketine' an jî 'her çi dibe bila bibe li wir her tim teror heye' qala kurdan dike.

Ev encama polîtîkayeke dehsalan a 'Li dîwar binêre, li dîmenê nenêre' ye. Nexşe, pirtûk, televîzyon, dibistan, bîranînên xizmeta leşkerî, henek û mîzah... ev hemû di çavên tirkan de, kurd di çarçoveyek teng de dorpêç kirin. Bi vî awayî, wêneyê jêrîn derket holê: kurd neçar man ku her tiştî li ser tirkan fêr bibin. Tirk bêyî ku hema hema tiştek li ser kurdan fêr bibin, dikarin bijîn. Ev nehevsengî ne tenê valahiyek zanînê diafirîne; di heman demê de tê wateya barekî giran ê psîkolojîk jî. Ji ber ku kurd li aliyê ku neçar e xwe biguncîne ye. Bêyî aksan bi tirkî diaxivin da ku karekî bibînin; ji nasnameya xwe dûr dikevin da ku di nîêrîna pêşîn de 'xeternak' xuya nekin. Bihîstina hevoka 'kurd, lê baş' û neçarbûna daqurtandina wê... ev hemû beşek ji pergalekê ye ku tê de 'norm' tirkî ye, lê kurdbûn wekî zêdegavî tê hesibandin ku bi berdewamî hewceyê ravekirin, parastin û sererastkirinê ye. Ji hêla din ve, tirk li navendê, 'norm' rûdine. Ew dikare bêyî ku bi kurdî bizanibe, bêyî ku tewra herî piçûk jî dîroka kurdan fêm bike, bêyî ku hewcedariya guhdarîkirina li êş û daxwazên kurdan, xwe wekî 'xwediyê welêt' hîs bike. Ji ber ku zimanê dewletê, zimanê dibistanê, zimanê dadgehan, zimanê medyayê, zimanê kolanê, bi piranî zimanê wî ye û nasnameya ku bi dewletê ve girêdayî ye bi piranî nasnameya wî ye. Di pergaleke wisa de, slogana 'tirk û kurd xwişk û bira ne' pir caran ji bo kurdan ji îroniyeke tehl wêdetir xuya nake. Xwişk û biratî di navbera wekhevan de, di navbera kesên ku hevdu nas dikin û barê hevdu parve dikin de mimkun e. Lê belê, li vir, divê mirov bi berdewamî fêr bibe, xwe biguncîne û bêdeng bimîne, di heman demê de yê din mafê axaftin û biryardanê hîs dike bêyî ku bizanibe, meraq bike yan jî pirs bike. Ji ber vê yekê ye ku bertekên li ser fêrbûna kurdî ya Gulayşe Koçak a di temenê xwe yê dawî de, wekî 'Keçê, tu dîn î? Çima kurdî?', ewqas diyarker e. Lê dîsa jî, xala Koçak pir hêsan û pir guncav e: Ma ne bi rastî ecêb û şerm e ku piraniya me kurdên li vî welatî heta radeyekê îngilîzî fêm dikin, lê em ji duyemîn zimanê herî mezin ê welatê xwe tiştek fêm nakin? Şerm e, ji ber ku ew îtîrafeke veşartî ye ku israr dike li ser parastina têkiliyeke neasîmetrîk.

---

Mûsa Şanak

# Li aramgehan şopên ciwaniyê

Ji bo mirovên fêmber mirin mamosteya herî mezin e. Belê, bes em lê binêrin. Bes em guh bidin ser... Dê gor û goristan yek bi yek bên zimên. Dê kêl bi kêl biaxivin bi me re. Dê dar bi dar, kulîlk bi kulîlk biaxivin... Em ê bibînin û têbigihîjin ku hemû paye, hemû cudatî û newekheviyên heyî bêwate ne.

Bala xwe bidinê... Wa ye li goristanan li kêlek hev radizên kurd, tirk, ereb û ermen; li kêlek hev radizên cihû, êzidî, îsevî û misilman; li kêlek hev radizên dewlemend û xizan, zarok, ciwan, kal û pîr... Giş ji axê hatin û li axê vegerîn. Giş bûn yek di hembêza xwezayê de. Ji wan ne ezezîtî ma li holê, ne peresît, ne armanc, ne hêvî, ne xirs û tirs, ne xem û xweşî, ne şik û şayîş...

Ku bijîn jî bi me re dijîn bi bîranînên xwe. Ew ên mijokdar û mêtinger, ew ên ku bi ti awayî têr nedibûn jî bi mistek ax têr bûn. Ma ev ne heqîqet e? Ma heye heqîqetek ji vê mezintir? Dema yek dimire li Dêrsimê dibêjin, çû ser heqiya xwe. Çûyîna ser heqiyê, ji her tiştî rizgarbûn e. Ango gihîştina heqîqeta xwe û azadbûn e.

Rast e, bi mirinê re her kes digihîje heqîqeta xwe. Wekî ku pêşiyên kurdan jî gotine, piştî ku dimire, herkes dibe qûnzêrîn. Loma kes li pey miriyan xerab nade. Ev bûye rêgezek exlaqî.

Ma tekane rê mirin e? Ma mirin nebe em ê tu carê nekarin xwe ji biyanîbûn, bênamûsî û bêrûmetiyê, ji dizî û tolaziyê, ji çavbirçîtî û kedxwariyê rizgar bikin? Ma ji xêncî mirinê ti rê nîn e ku me bigihîne heqîqetê?

Şoreşgerî, hayjixwebûn, gav bi gav lixwevegerîn, têkoşîna xwebûnî û azadiyê... Ma ev hemû ne hewldan û têkoşîna xwegihandina heqîqetê ne?

Di xwe de avakirina xwebûniyek civakî ya demokratîk a wekhev û azad, xwe ji her cure cudakarî û zêdehiyê rizgarkirin e. Xwebûnek wiha ya civakî gihiştina heqîqetê bixwe ye. Di vê wateyê de heqîqet bi serxwevehatin e, vejîn e, xwe jinûveavakirinek jiyanî ye. Bi her awayî tê jiyîn.

Ev demek e, bi ku de biçim rêya xwe li goristanan dixim. Li aramgehên qedîm û nû li şopên ciwaniya xwe digerim. Li şopên rêhevalên xwe, li şopên rûyên biken ên rûspiyên zarokatiya xwe digerim. Diçim ser gorên wan, li ber kêlên wan rûdinim, çavên xwe digirim û wan bi bîr tînim di nav xwe de. Dema li wan difikirim, ew candar dibin û derdikevin pêşberî min di pêşangeha bîra min de. Xweşbêş dikim bi wan re. Ez piçekî dimirim bi wan re, ew piçekî vedijin bi min re.

Dema çavên xwe vedikim û dîsa tevî çemê jiyanê dibim, di kûrahiya dilê xwe de germahiyekê û di xwe de guherînekê hîs dikim. Xwe bixwe dibêjim, nexwe bi rênîşiya wan nemiran hinekî din nêzî heqîqeta xwe bûm...




Çend roj in ku em ketine pey şopa du hevalên herdemciwan. Navê yekî Ahmet Çelîktaş, yê din Bakî Kan e. Hîn dibim ku gorên wan li gundê Kurdimîk/Kurdemlîkê yê Xarpêtê ne. Em çar kes biryar didin, rojekê diyar dikin û bi hev re diçin serdana wan. Em sê kes di zûtira sibê de ji Amedê bi rê dikevin, yek jî ji Pêrtagê. Em li navenda Xarpêtê li derdora Qeraca Xozatê digihîjin hev, bi hev re xwarinekê dixwin û berpêyî gund dibin.

Du kes ji me heval û merivên wan herdemciwanan in. Ew di heman demê de rênîşên me ne jî. Li gorî tabelayan rêya gund 20 km ye. Di rêya teng û bifetil de em diçin û diçin, hildikişin serê çiyayan û dadikevin neqeb û bestan, ji gund an jî mezreyekê derdikevin û dikevin yeke din... Her ku nêzî gundekî dibin, em dibêjin qey em gihîştin cihê xwe. Lê rênîşên me dibêjin, ne ev gund e û em rêya xwe didomînin.

Ew cara yekemîn e ku rêya min li wan deran dikeve. Ji aliyekî ve jî ez li wî dîmenê xweşik ê payîzê temaşe dikim û xwe bixwe dibêjim, gelo dê bihara vir çawa be? Cihekî ku dîmenê payîza wê ewqas xweşik be, dîmenê bihara wê jî teqez dê ji vê xweşiktir be.

Dema em derdikevin ser girekî ji dûr ve gola bendava Kebanê xuya dibe. Em hinekî dadikevin û li ber goristana li raserî gund radiwestin. Rênîşên me dibêjin, em hatin û peya dibin. Em ên mayî jî didin pey wan. Berê gora rêheval Bakî Kan me pêşwazî dike. Ev goristana gundê wan e û ew jî mazûvanên me ne. Berî ku çavên xwe dadim û bi wan re biaxivim, li her du hevalên wan ên qedîm dinêrîm. Wan bi lez destêyek gul danî ser gora Bakî û çûn serdana gora Ahmet Çelîktaş û desteyek gul jî danî ser gora wî, xwe li hev pêçan û giriyan. Em jî ketin bin bandora wê hewaya wan. Qasek bi şûn ve me gihayên li ser gorên wan paqij kirin, ew bi gulan xemilandin û bi rêzdarî bi bîr anîn.

Ahmet Çelîktaş, 1ê çileya 1960î, li vî gundî hatiye dinê û 22yê nîsana 1980yî jî li gundeki nêzî Pêrtagê şehîd ketiye. Di dawiya salên 1970yî de li Xarpêtê hevalan nas dike û tevlî nav refên azadiyê dibe. Tevgera Azadiyê navek li xwe nekiribe jî li her herêmê bi navekî cuda hatiye nasîn. Wekî Telebe, Apoyî, UK (Rizgariya Neteweyî) û hwd. Wê çaxê li aliyê Xarpêt û Dêrsimê jî wekî UK/UKO hatiye binavkirin. Hevalê Ahmed bi vîn û baweriyek mezin bi tevgerê ve tê girêdan. Hevalekî wêrek û çalak e. Bi vê taybetiya xwe derdikeve pêş û di çalakiyekê de şehîd dikeve.

Bakî Kan, sala 1960î hatiye dinê û sala 1986an şehîd ketiye. Wekî herêm li cihekî nêzî gundê xwe şehîd ketiye û li goristana gundê xwe hatiye veşartin.

Şopên wî yên gerîlatiyê yên li wan derdoran hîn wenda nebûne. Rêhevalên wî li ser pirsa me wî wiha pênase dikin û dibêjin: "Hevalê Bakî di nav nifşa yekemîn a UKOyî ya Xarpêtê de hat perwerdekirin. Yekî pir sadiq, jîr û jêhatî bû. Pir jidil bû û pir hez ji welatê xwe dikir. Welatparêzekî çavsor bû. Te çi kar bidaya ber, wî bê îtîraz dikir. Wî qet guh neda ser daxwaz û sepandinên malbatê û xwe bi her awayî tevlî têkoşînê kir. Hevalekî wêrek, rûken û rêzdar bû..." Xuya ye ku dixwazin pir tiştan bibêjin, lê kela dilê wan qirikê li wan teng dike.

Bakî û Ahmed him gundiyên hev, him jî heval û hemsalên hev in. Li heqîqeta xwe, li çand û nasnameya xwe xwedî derketin; ji bo parastin, jiyîn û jiyandina heman heqîqetê têkoşiyan. Şehadeta Ahmed ji bo demekê ew ji hev qut kiribin jî, sala 1986an, dîsa digihîjin hev di hembêza dayikaxê de. Ewqas dem di serê re borî, lê ew hîn ciwan in û dê her tim wisa bimînin.

Kêliyek tê em xatirê xwe ji her du herdemciwanên hêja û birûmet dixwazin û berpêyî gund dibin. Rênîşekî me rezên li milê rastê rêz bûyî nîşan dide û dibêje, ji wir re dibêjin Rasta Rezan.

Zinarê mezin û asê yê li wî aliyê newalê yê li hemberî rezan jî nîşan dide û dibêje, ew der jî Kevirê Hingiv e. Li gundê me jî Kevirê Hingiv heye. Li çend cihên din jî rastî heman navî hatim. Nexwe Kurdistan di heman demê de welatê mêşan û hingiv e jî.

Berî ku bigîhîjin gund em li ber zinarekî mezin ê li milê rastê sekinîn, ji erebê daketin û bi hev re derketin ser zinarekî gilover ê li milê rastê û me bi heyranî li derdorê mêze kir. Navê wî zinarî jî Toptaş ango Kevirê Gilor bû. Dîmenekî nûwaze hebû li pêşberî me. Dema em ji wir daketin û çûn nava gund, me pirsa malbatên hevalan kir. Me xwest, em hîn bibin ku bê ka kes ji wan li gund heye yan na. Kesê ku me pirs jê pirsî jî pismamê heval Bakî derket. Me paketek şîranî û çend diyarî dan wî, em pev re çûn nav baxçe û bostanên wan. Wî jî hin sewze û mêwe wek diyarî dan me.

Em gihîştibûn dawiya vê serdana xwe. Êdî dema vegerê bû. Diviya bû ku berî daketina tariyê em xwe bigihînin navendê. Li vegerê jî me silavek da her du herdemciwanên xwe, ji her yekî parçeyek hilda dilê xwe û rêya xwe kudand.

Ji destpêka vê rêwîtiyê bigire heta dawiya wê, di her merheleyek wê de ez rastî parçeyekî xwe hatim. Hin tişt hebûn ku min ji bîr kiribûn û ji nû ve bi bîr anîn. Ev yek jî dê ji bo min bibe egera rêwîtiyek derûnî ya navxweyî û rê li ber ger û rêwîtiyên nû vebike.

Ev nivîs bixwe jî rêwîtiya di rêwîtiyekê de ye. Bi saya vê em dikarin dubare dubare biçin serdana heman aramgehê. Dikarin wan her du rêhevalan di nav xwe de bijîn û bidin jiyandin...

Û di şexsê wan de jî hemû cangoriyên Şoreşa Azadiyê....

# Licê de şero taybet û perspektîfê komelo ehlaqî

Merkezê Xeberan




Ewro Licê de, kuçe û kolanan de, heta mîyanê dibistanan de vilabîyayîşê maddeyanê hişberîyan tesaduf nîyo. Sîstemo hukimdar, cayê ke tede hîşê sîyasî û neteweyî xurt o, uca de wazeno ke ciwanan nê hîşî ra dûrî bifino. Seba nê armancî zî, çeko tewr tesîrin maddeyê hişberî û fuhuş o. Bi nê her di silgiran, wazenê ke ciwanê kurdî nasname, kultur xo û doza xo ya azadîye ra dûr bifinê û bibê koleyê sîstemî.

Rêxistinê komelê sîvîlî û partîyê sîyasîyî yê herême zaf reyî raporanê xo de dîyar kenê ke kesê ke nê jehrî (maddeyan) vila kenê, tewr zaf hetê hêzanê "emnîyetî" ra yenê pawitene ya zî çimê xo nê kesan ser o gênê.

No zî musneno ke no "bazirganîya" tenya karê çeteyan nîyo, parçeyêkê konseptê şerê taybetî yo. Armanc o yo ke Licê de ciwanê ke gerek pêşengîya komelî bikerê, nêverdanê ke xo bişinasnê; êyê ke ganî vera zilmî vejîyê, binê tesîrê maddeyan de bêrê bêhêzkerdene.

**'Modernîteya Kapîtalîste û qirkerdiş'**

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan, nê polîtîkayan tenya sey "sucê edlî" nêvîneno. Ocalan nê wezîyetî sey "Qirkerdişê Kulturî" û hêrişê vera "Komelo Ehlaqî û Polîtîk" pênase keno.

Goreyê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî, modernîteya kapîtalîste seba ke hukmê xo dewam bikero, no ser zî komelî hûre bi hûre parçe keno. Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan, kitabanê xo de wina vano: "Sîstemo kapîtalîst, seba ke kesayetê azadî çin bikero, her tewir metodan şuxilneno. Fuhuş û maddeyê hişberî, tenya meseleyê şexsî nîyê; nê sigirêko sîstematîk ê ke seba kolekerdişê ciwanan û cinîyan yenê xebitnayene." Goreyê felsefeya Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî, têkoşînê vera nê xirabîyan, eynî wext de têkoşînê vera sîstemê desthilatdarî yo.

Ocalan bala anceno ser ke kapîtalîzm beden û ruhê merdiman keno meta (mal) û roşeno. Fuhuş, nê "bazarîkerdişê bedenî" ra yew o. Labelê Ocalan vano ke fuhuş tenya rotişê bedenî nîyo; "Fuhuşo tewr gird, o yo ke merdim fikrê xo, rûmetê xo û welatşinasîya xo biroşo."

**Licê de cinî û ciwanî: Hedefê serekeyî**

Licê de polîtîkayê fuhuşî, xusûsen seba şikitişê îradeyê cinîya kurdî yeno rayirberdene. Cinîye, mîyanê kulturê kurdan de û têkoşînê azadîye de wayîrê cayêkê girdî ya. Eke cinîye bikewo, komel keweno.

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan, azadîya cinîye sey "Azadîya komelî" vîneno. Coka, sîstem zî seba ke komelî teslîm bigîro, verê cû cinîyan hedef gêno.

Tarixê têkoşînê azadîya Kurdîstanî de Licê cayêko zaf girîng û stratejîk gêna. Labelê, serranê peyênan de, xusûsen nê demê taybetî de, Licê û dormerayê ci de tayê polîtîkayê cîyayî û bixetereyî yenê rayîrberdene. Nê polîtîkayî, rasterast vera ciwanan û cinîyanê kurdan hedef gênê

Wexto ke ma ewnîyenê Licê ra, ma vînenê ke tayê "karmend/memurî" yan zî kesê ke sîstemî ra girêdayeyî yê, bi nameyê "eşq" û "dostîye" nêzdîyê keynayê ciwanan benê û dima înan ancenê mîyanê batakxaneyê fuhuşî û ajanîye. Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan vera nê kayan zaf hîşyar keno û vano: "Cinîya azade, cinîya ke xo, nasnameyê xo û zayendê xo şinasnena ya. Vera şerê fuhuş û kulturê tecawuzî, şerê rûmetî yo."

**Çareserî: Xopawitişê cewherî yo**

Vera nê polîtîkayanê lêminan de çareserî çi ya? Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan û têgirê ey, çareserîye "Komelo ehlaqî û polîtîk" de vînenê. Ciwanê Licê ganî nê kayanê lêminan bivînê.

**Sîlaho tewr gird hîşmendî yo**

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan vano ke "Sîlaho tewr gird zanayîş û hîşmendî yo." Ganî keyeyî, şaredarîyî û dezgehê sîvîlî ciwanan perwerde bikerê û înan nê dameyan (tuzaxan) ra bipawê.


Komel ganî vera maddeyanê hişberîyan û kesê ke fuhuşî teşwîq kenê, bertekê xo bimojno. No, parçeyêkê "Xopawitişê cewherî" yo. Xopawitiş tenya bi çek nêbeno; pawitişê kultur û ehlaqê xo zî xopawitiş o.


Vera ciwîyayîşê modernîteya kapîtalîste ke merdiman keno sey robotan û gêj keno, ganî alternatîfê "ciwîyayîşê azadî" bêro awan kerdene.

Çîyê ke ewro Licê de qewimîyenê, cîya-cîya nîyê. Licê, seba ke merkezê xoverdayîşî yo, bi zanebiyayîş yeno hedef kerdene.

Polîtîkayê uyuşturucu û fuhuşî, parçeyê konseptê "çinkerdişî" yê. Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan, nê wezîyetî sey nêweşîya komelî pênase keno û dermanê ci zî bi "Azadkerdişê hişî" û "Rêxistinkerdişê komelî" nîşan dano.

Waştişê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ciwanan ra no yo: "Xo, bedenê xo, hîşê xo û welatê xo bipawê. Hêzê ke wazenê şima bêhiş bikerê, dişmenê tewr pîl ê merdimeyîye yê." Coka, xoverdayîşê Licê, tenya vera tank û topan nîyo; ewro xoverdayîşê tewr girîng, xoverdayîşê vera lêminkerdişê ehlaq û wicdanî yo.





Mihemed Kurdî

# Gelo çira vernîya mergê karkeran nîna girewtiş

11 ê teşrîna peyêne de îskeleya pirdê yê rayîrê Pasûr û Mûşî ser o yê ke hetê DSÎ'yî de yenê viraştiş, gama ke beton rokerdêne rijîya. Bi rijyayîşê iskeleyî reyde 5 karkerî kewtî war û înan ra 4 tenî merdî û yê bînî zî bi awayêko xedar birîndar bîyê. Rijîyayîşê îskeleyî ancî şert û mercên giran û xedar yê karkeranê ma ardê çiman ver, bi arizî zî ardê çimê şarê ma ver, çimkî seke ma pêro zî zanê zafê kesê ke karê awanîyê kenê kurd ê û xora ê çar karkerê ke bîyê qurbanê ê cînayetê zî kurd bîyê û licêyij ê.

Dinya de her pancês saniye de karkerêk qeza û nêweşîyanê karî ver mirenê. Vakurê Kurdistanî û Tirkîya de zî her serre di henzarî ra vêşêr xebatkarî, karî ser o de mirenê. Goreyê raporanê Meclîsê Weşîye û Asayîşê Karî tenya aşma teşrîna peyêne de tewr kemî 216 xebatkarî wexto ke karî ser o de yî merdê. Bi ê mergan reyde emser (2025) heta nika tewr kemî 1956 tûtî, ciwanî, cînî û kokimê demê xebityayîşê de merdê. Goreyê melumatan, tewr vêşî sektorê res, awanî û karitiş de karkerî mirenê. Ancî goreyê vatişanê pisporan humarî ke saziya tendurustîya karkeran vanê; raşt nîya, yanê ê humaran ra vêşêr karkerî mirenê, la selahîyetdar bi zanayîş mergê karkeran rayapêroyî ra nimitnenê.

**Sebebê cînyetanê karî çîyê?**

Goreyê beyanatanê Rêxistina Weşîyê ya Dinyaye (WHO) her serre dinya de nêzdî hîrê mîlyon karkekerî bi qeza û nêweşîya karî ver mirenê. Tirkîya de cînayetê karî vêşî benê, bi arizî zî enê serranê peyênan de. Reyna goreyê melumatan, Tirkîya hetê mergê karkeran ra, Ewropa de yewin a. Na zî mojnena ke Tirkîya de ne ercê merdiman, ne zî erjê ganê karkeran esto. Çimkî goreyî welatanê yê Ewropa, mergê karkeran Tirkîya de qat bi qat vêş o.

Tirkîya de bi milyonan tût, cînî, ciwan û kokimî şert û mercanê zaf zehmetan de, bê teftîş û bêtedbîrê ewlekarîyî û bi seatanê dergan de yenê xebitnayiş. Yanê ne dewlete û ne zî kardayoxî, cuyê karkeran fikirîyenê. Bêguman teftîşnêkerdişê dewlete, beno sebebê ke kardayoxî zî berpirsîyarîya xo nêanê ca. No zî beno sebebê îhmalkerdişî. Xora semedê qezayan û cînayetan o pîl zî no îhmal o.

Bêperwerdeyî zî bena sebebê cînayetanê karî. Welatanê Ewropa de, verî ke karkerî dest bi karî bikerê, hetê dewlete ra meslegî înan ser o yenê perwerdekerdiş û heta o karkerî perwerdeyê xo de serkewte nêbê, dewlete destûra karkerdişê nêdana înan û bi no qaydeyî vernîya qezayan û cînayetanê karî girênê. Tirkîya de wendegehê kar û meslegî kemî yê û yê ke estê zî kêmaneyê înan yê binawanî zaf ê. Coka zafaneyê karkeran bê ke derheqê beşê xo de perwerde bibê zî, hema ca de dest bi karî kenê, enê zî riskê qezayanê karî vêşî kenê.

**Semed rincanbîyayîş o**

Yew sebebê qezayan o pîl zî rincanbîyayîş o. Goreyê pisporan, karkerî ke bi seatanê dergan xebitîyenê riskê yê qezayê înan, goreyê karkeranê bînan hîna zaf o. Bi saetanê dergan xebityayîşê karkeran, tena hetê fîzîkî ra nê, wina hawa hetê zîhnî ra zî rincan benê û qezayanê neweyan rê rayîr abeno. Na rewşe; zafê ey, karkeranê kiriştoxan de, karkeranê maden û awanîye de xo nawnena.

Tirkîya de bi zafane sektorênê arizî de, tedbîrê ewlekarîyê nîynê girewtiş. Nê sektoran de kardayox, seba ke hîna zaf kar bikerê û melîyetî kemî kenê. No semed ra ekipmananê/hecetanê pawitişî yê ke hewce kenê, temên nêkenê. No zî cuyê karkeran defîneno xeter û beno semedê qezayan.

Goreyê pisporan, eke wextê xo de tedbîrî bêrê girewtiş, do vernîya zaf cînayetan zî bêro girewtiş. La seba ke Tirkiya de mergê karkeran, girewtişê emnîyetê karî ra erjanêr o, tu kes cuyê karkeran xo rê nêkeno xem û tedbîrî ke hewce kenê nêgêno.


**Senî eşkenê vernî bigêrê ?**

Bêguman heta ke nê welatî de kardayox, îdarekar û temsilkarê dewlete, bi çimê xulaman biewnî karkeran ra, çi rey cînayetê karî kemî nêbenê. Rayna heta ke Tirkîya de, mergê karkeran girewtişê emnîyetî ra erjanêr bo çi rey cînayetên karî kemî nêbenê.

La wexto ke tedbîrê ewlekarîye hetê kardayoxî ra bêro girewtiş û dewlete zî wezîfeyê xo yê teftîş û kontrolkerdişê wextî de bi ca bîyaro, o çax vernîya zaf cînayetanê karî zî do bêrê girewtiş. Reyna eke kardayox û karkerî derheqê emnîyetê karî de bêrê perwerdekerdiş, bêguman do Tirkîya de zî sey Ewropa hûmara cînayetanê karî kemî bibê.

Raşta ci eke dewlete qanûnanê emnîyetê karî xurt bikero û mekanîzmaya teftîş û kontrolkerdişê karî zî bi awayêko nîzamî vêşî bikero, o çax do riskê cînayetan zî zaf kemî bibê û vernîya mergê karkeran bêro girewtiş. Yanê wexto ke dewlete qedrê karker û şarê bizano , o çax kardayoxî zî mecbur î ke erjê karkeranê xo bizanê.

Ez semedê her çar karkeran o ke Pasûr de rehmet kerdbî, Homayî ra rehmet wazena. Reyna keye û heskerdoxanê înan rê zî sebir wazena, birîndaran rê şîfa wazena.




# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-Mamê mino***
Tiştek heye bi gotinê tê şikandin
Ew çi ye?

***2- Mamê mino***
Bi deng û xuşexuş e
Bêling dimeşe
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
***1-*** Bêdengî ***2-*** Ava çeman

# Şerîfo tev li xutbeya înê bû


**Miradê Dêrikê**

Şerîfo roja înê çû camiyê û di rêza pêşî de li hemberî melayê camiyê rûnişt. Mele dest bi xutbeya xwe kir lê Şerîfo her ku li mele mêze dikir, dibû îskeîska wî û digiriya. Di dawiya xutbeyê de mele çû ba Şerîfo û jê re got xuyaye tu mirovekî salih î, îro were mala me em bi hev re şîvê bixwin.

Mele şîveke xweş ji Şerîfo re amade kir û li ser şîvê ji Şerîfo pirsî, ''Ev bû 20 salên min ku ez xutbeyan didim, ti caran ewqasî bandora min li ser kesekî çênebû. Tu çima ewqasî digiriyayî û herî zêde bandora kîjan gotinên min li ser te çêbû.'' Şerîfo got, ''Te ya rast divê ya pismamê rastiyê.'' Mele got, ''Na ya rast bêje.'' Şerîfo got, ''Beriya çend rojan nêriyê me mir, rihê te gelekî dişibe yê nêriyê me, her ku te rihê xwe dihejand nêriyê me dihat bîra min û xemgîn dibûm.'' Mele şaşika xwe ji serê xwe avêt û bi pihînan Şerîfo ji mala xwe derxist û jê re got: ''Hey zindîq, min digot qey bandora gotinên min li te bûye û tu bi wan digirî, wey naleta Xwedê li te û nêrîyê te were û xwarina min li te jehr be.''



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Ne dirêj ***5-*** Vexwarina sereke ***7-*** Tevahî, giştî ***8-*** Paşdaçekek ***9-*** Rih
***13-*** Li gorî ola islamê zilamekê yekemîn hatiye dinyayê ***14-*** Bersiva erênî
***16-*** Amûreke şer a kevnar ***19-*** Cihê hilanîna kayê ***20-*** Agir ***21-*** Xemla çavê jinan
***22-*** Rengek ***25-*** Daçekek ***26-*** Ne piratîk ***28-*** Êş, kovan, hesret

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Kesê ku bi karê birîn, kirîn û firotina daran dadikeve
***2-*** Paytexta Îtalyayê
***3-*** Cînavkeke pirsiyariyê
***4-*** Nîşe
***6-*** Fêkiyek
***10-*** Bajarekî bakurê Kurdistanê
***11-*** Navekî jinan, di wateya nazik, delal de
***12-*** Wext, zeman
***15-*** daneke rojê
***17-*** Dawî
***18-*** Ne giran
***20-*** Meheke biharê
***23-*** Ne mê
***24-*** westandin û têkoşîna di karekî de
***27-*** Kar û xebat

## Bersiva hefteya borî





Dildarê Amedê

# Lingê pêvajoyê yê Rojava

Di vê dema dawî de, gelekî serpêhatiyeke biçûkatiya min tê bîra min û li ser wê serpêhatiyê pir difikirim. Wê demê ez hîna zarokekî 6-7 salî bûm. Zarokê cîranê me lîstoka min a ji têlan çêkirî ango zîzoka min xera kir.

Lawikê cîrana ji dexsokiya xwe, çima ku zîzoka min a bi rêşiyan xemilandî ji ya wî xweşiktir bû, pê li zîzoka min kir û tev pelixand. Min jî xwe avêt newqa wî û ew li erdê da. Min ji kerba hinekî zêde lê da û diranekî wî şikand. Bi texmîna min jixwe berê diranê wî dileqiya û li ber ketinê bû.

Diya zarok hat giliyê min ji diya min re kir. Diya min qet li me nedida lê bavê min rehma xwedê lê be gelekî bêhnteng bû û gelek caran bi lêxistinê em ceza dikirin. Diya min ji bo dilê cîrana me xweş bike û kîna di navbera min û kurê cîranê me de kêm bibe gef li min xwarin û got ka wê şimika min bîne. Min jî di dilê xwe de got; 'Diya min ji bo dilê jinika cîranê me xweş bike wiha dibêje ez şimikê bidimê jî wê min neêşîne.'


Min şimik da destê diya xwe û kero te çi xwariye. Bi destekî ez zeft kirim ku nerevim û bi destê din jî bi wê şimika xwe ya nalyon qûna min reşo şîno kir. Baş e ku cîrana me jineke dilbirehim bû, wê ez ji nav destê diya ez xelas kirim. Îca di vê dema ku behsa çekberdanê jî tê kirin, ew çîrok tê bîra min û ez dibêjim xwezî min dest ji çeka xwe berneda beriya ku min gerantiyek bi dest bixista. Îca madem diya min bêçekbûna min wiha bi kar anî, dê neyarê bav û kalan çawa bi niyeteke baş çekdanîna min pêşwazî bike.

Bi her sê navên xwedê heta ku dewlet hin gavên berbiçav û hêja navêje divê em çekên xwe bernedin. Niha hikûmeta demikî ya Şamê jî dixwaze em çekên xwe deynin û li benda wijdan û merhemeta wan bimînin da ku hin mafan bidin me. Jixwe wekî general Mazlûm Ebdî jî got; 'Em ji dema ku ew serkêşê Cebhet el Nusra bû hev nas dikin.' Mane ew bû ku ji destpêka bûyerên Sûriyeyê de êrişî bajarên kurdan kir, mane ew bû dixwest ku Serê Kaniyê dagir bike.

Kurdên Rojava wê ti caran çekên xwe ji destê xwe daneynin û qedera xwe teslîmî wan komên radîkal nakin ku bi hişmendiya çeteyan tevdigerin.

Her çendî ku di vî warî de hêzên tarî û organîzatorên şerê taybet gelek nûçe û nêrînên tevlihev servîs dikin, di vî warî de, hem nêrîna rayedarên kurd û hem ya serokatiyê aşkera û zelal e. Serokatî berê gotiye Rojava xeta min a sor e.

Kurd û serokatiya xwe di vî warî de zelal in, dixwazin bi rêya diyalog û rêbazên aştiyane hemû pirsgirêkên xwe bi desthilatdaran re çareser bikin. Lê mixabin heta niha aliyên din hîna jî li hêviya fen û xapandinê ne û ti gavên bi dilekî safî û berbiçav ji bo çareseriyê neavêtine ku baweriya gele kurd bi wan were û bi dilekî germ xwe tev li vê pêvajoyê bikin. Çareserî tenê bi gavên wêrek û berbiçav pêkan e.




Kurd di vî warî de, semîmî û ji dil tevdigerin û heta niha gelek gavên pratîk ên mezin avêtine. Lê heta niha hem desthilatdarên dewleta tirk hem jî desthilatdarên Şamê ti gaveke erênî û berbiçav ên ku dilê gele kurd xweş bikin, neavêtine.

Kurd bi her awayî ji bo aştiyeke birûmet ya li ser bingeha edalet û wekheviyê amade ne lê heke çavên wan desthilatdaran li xap û fenan bin, kurd jî bêalternatif nînin.

Ew hêza kurdan a ku bi deh rêhevalan 40 salan li ber xwe da û bû xwedî bi milyonan alîgir, dikare bi wan milyonan rêya xwe heta hetayê berdewam bike.

Divê beriya her tiştî Şam û Enqer zimanê medyaya xwe ya alîgir biguherînin. Ew di hemû weşanên xwe de wek gurên har êrişî gelê kurd dikin û wekî ku ev pêvajoya çareseriyê li welatekî din dimeşe tevdigerin. Ew ti caran pêvajoyê naxin mijara weşanên xwe. Li ser medyaya dîjîtal jî karwanekî alîgirên xwe ava kirine ku karê wan belavkirina nûçeyên derew e û dixwazin rojekê berî rojekê vê pêvajoyê biqedînin ku hestî û kulûjên wan ji destê wan neçin.

# Çend gotin li ser mihrîcana muzîkê

Platforma Mûzîkê ya Bajêr a Wanê berxwedana li hember asîmîlasyonê didomîne û di vê çarçoveyê de li taxan mihrîcan hat lidarxistin. Bi hêmaya aştî, azadî, keda jinê û ekolojiyê xebateke kolektîf hat meşandin û parvekirin

Bêrîvan Kayi

Çend meh berê li Wanê lêgerîneke mûzîkjenan hebû ku di bin sîwaneké de bên gel. Ji aliyekî ve pêvajoyekê dest pê kir û deriyê çand û hunerê ango ew rola wê ya ku xeleka aştî û azadiyê firehtir dikir, derkete holê. Di encama axaftin û hevdîtinên hunermendên li cih û mekanên cuda de, biryara hevpar a ku divê hunermendên herêma Serhedê, bên gel hev û orkestrayeke bajêr bê avakirin, hat dayîn.

Ji bo destpêkê 60-70 mûzîkjenên li Wanê bi armanca ku mûzîkeke kolektîf ava bikin, hatin gel hev û wek gava yekemîn hemûyan bi hev re biryar da ku kampeke mûzîkê bê lidarxistin. Di navbera 27-28 tîrmehê de bi atolyeyên mîna dîroka mûzîka kurdî, jinên kurd û dengbêjî yên wek Zeynep Yaş Genim ( Koma Çiya) û Serdar Canan û hwd li kêleka gola Wanê, me kampa xwe çêkir û li wir bi navê 'Platforma Mûzîkê ya Bajêr a Wanê' damezrand. Ewilî em bi 60-70 mûzîkjenên li bajêr çûn kampê û di encama 2 rojan de hejmara endamên platformê bû 97 kes. Ev hejmar dihat wateya ku ji mûzîkjenên kolanên Wanê heta, yên dawetan, yên li kafeyan û her wiha yên li sazî û dezgehan û yên di komên zanîngeha Wanê de her yek ji wan rêya wan derkete vê platformê. Ew roj ev roj e, bi gelek kar û xebatên wek atolyeyên li ser hûrgiliyên mûzîkê kurdî û her wiha li ser mûzîka dinyayê, kar û xebatên rengîn hatin kirin.

**Komên kolektîf hatin avakirin**

Herî dawiyê yek ji xebatên platforma bajêr jî mihrîcana mûzîkê bû ku ji 10 kanûnê heta 14ê wê berdewam kir. Ji bo mihrîcan yekemîn a platformê ji nav mûzîkjenên platformê komên mûzîkê yên cur bi cur hatin gel hev û kom hatin avakirin. Yek ji taybetmendiya van koman ew bû ku ji tevahiya hunermendên platformê muzîkjenên ku heta wê demê di komek an jî di bernameyekê de nehatî gel hevdu, li ser dikê bi navê komên cuda stranên xwe gotin. Wek koma Siya Roj, Koma Zeng, Dîwana Jinan, Komkurd û hwd.

**Peyama ji bo Rojîn Kabaîş**

Bi taybetî di roja yekemîn a mihrîcanê de koma bi navê Dîwana Jinan ku ji stranbêjê wê heta her amûrjeneke wê jin bû, derkete ser dike. Dîwana Jinan tevahiya xebat û stranên xwe diyarî xwendakara zanîngehê Rojîn Kabaîşa kir ku salek berê li Wanê bi awayekî biguman wenda bû û piştre bedena wê li keviyê gola Wanê hat dîtin. Plaketa vê komê jî wê ji aliyê malbata Rojînê ve bihata dayîn lê ji ber ku malbat di dîroka mihrîcanê de ne guncav bû, ji aliyê yek ji parêzer û berdevka Komeleya Jinan a Starê Zeynep Demîrê ve hat dayîn. Tenê di roja yekemîn a mihrîcanê de na, hema bêje 10 komên platformê jî bal kişand ser bûyera Rojînê û daxwaza xwe ya divê bi awayekî lez bûyer bê ronîkirin û kujerên wê bên cezakirinê, anîn ziman.

Yek ji xeleka mihrîcana platforma bajêr jî ew bû ku bi şiara 'Mûzîk Azad Dike, Aştî Mezintir Dibe' bal kişand ser pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk. Jixwe platform bixwe jî li ser wê bingehê hat avakirin ku di atmosfera aştiyê de hunermendên li Wan û Serhedê rola xwe bînin cih. Her hunermendê di komê de li ser dikê peyamên mîna 'Bila êdî li ser vê axê aştiyeke mayinde bê avakirin û dayikên me rondikan nerijînin, em naxwazin êdî stranên li ser êşa dayikên me bistrên' dan.

**Mihrîcana li nav gel**

Yek ji xalên ku bala mirov dikişandin jî cihê lidarxistina mihrîcanê bû. Navenda Çanda Berîvan a li Bostanîçiyê ya ku li taxeke ji navenda Wanê dûr bû. Gelek konser, şahî û tevahiya kar û barên çand û hunerî bi gelemperî li cihên navendî yên bajêr dibin û kesên li taxan ji van bername û şahiyên bi vî rengî kêm diman. Bi vê armancê platformê biryara xwe ya ku hê zêdetir mûzîka gel bila nêzî gel be, da û jixwe di 5 rojên mihrîcanê de jî ji taxê jin, ciwan, zarok û dayik bi eleqeyeke mezin tev li vê şahiyê bûn.

**Kar û xebatên li dijî asîmîlasyonê**

Platforma Mûzîkê ya Bajêr a Wanê yek ji xalên wê yên bingehîn jî tevger û berxwedana li hember asîmîlasyona bêeman bû ku çawa li ser her şaneya civakê hat/tê meşandin, bi heman awayî li ser stranên kurdî jî didome. Ji ber wê jî hem komên di çerçoveya mihrîcanê de hatî avakirin hem jî tevahiya atolyeyên xwe de hewl dide kar û xebatên xwe bi zimanê xwe bimeşîne.

Bi kurt û kurmancî, di platformê de li ser bingeh û hêmaya aştî, azadî, keda jinan, ekolojî û li ser mûzîka bi zimanê dayikê, tevdigere û li gor vê ferasetê kar û xebatên xwe yên kolektîf dimeşîne.



# Peyva Çandê

Cebraîl Vural

Me di nivîsarên xwe yên berê de qala pênaseya çandê, çanda cotkariyê, çanda dawetê û mêvanperweriyê kiribû. Em ê di vê nivîsarê de jî qala bendûbariya peyvê bikin.

Em dizanin peyv, nîşaneya mirov a sereke ye ku mirov pê ji alema heywanan veqetiyaye. Çimkî, cinsê mirov, destpêkê bizarî dengên xwezayê kiriye û bere bere fêrî peyivînê bûye. Fêrbûna peyvê, bi keda bi hezarên salan bûye çandeke jêneger. Her peyveke wê çandê watedar e û ew ê kengî, li ku, çawa û ji kê re were gotin diyar e.

De îcar em ê di vê nivîsara xwe de bi kinahî çanda peyivîna kurdan a kevnar û ya nûjen hevrû bikin û nêrîna xwe ya ji bo bendûbariya peyivînê bi lêv bikin.

Mesela, di çanda peyivîna kurdan a kevnar de têkiliya navbeyna jin û mêran, biçûk û mezinan, mêvan û mazûbanan çawa bû? Gelo ew têkilî niha di kîjan rewşê de ye?

Di çanda civaka kurd a kevnar de mêr dipeyivîn jinan guhdarî dikir, mezin dipeyivîn biçûkan guhdarî dikir û mêvan dipeyivîn mazûbanan guhdarî dikir. Çima gelo?

Çimkî, civaka kurd a kevnar, exlaqî bû û di civakên exlakî de kî dê li kê guhdarî bike diyar e! A rast, peyivîna mêvên û guhdarîkirina mazûbên, di kîjan civakê de jî be maqûl e, lê peyivîna mêran guhdarîkirina jinan, peyivîna mezinan guhdarîkirina biçûkan, pirsgirêk bû! Her çiqas ku di peyivîna mezinan û guhdarîkirina biçûkan de rêzeke civakî hebe jî, di azadiya ramanê de bendek bû! Jixwe peyivîna mêran û guhdarîkirina jinan pirsgirêkeke mezin bû!..

Niha jî em ê lê binihêrin bê ka di civaka kurd a nûjen de têkiliya peyvê a navbeyna jin û mêran, mezin û biçûkan, mêvan û mazûbanan çawa ye?

Em her roj bi çavên xwe dibînin û bi guhên xwe guhdarî dikin ku di vî çaxê civaka nûjen de, helbete bi têkoşîna Serok re, jin jî êdî dikarin di civatê de bi rehetî bipeyivin, lê mêr, hê jî bêdil li jinan guhdarî dikin, çimkî mêr, di hiş de xwe de qanih nebûne û ev rastî, di her fersendê de xwe dide der!

Her wiha, di civatan de, berevajî civaka kevnar, êdî biçûk dipeyive, mezin bêdeng dibe û mazûban dipeyive, mêvan bêdeng dibe!

Bi kurt û kurmancî berî her tiştî, em civakeke exlaqî, rêzan û şoreşger in.

Civaka exlaqî; ji ber ku civaka me, civakeke exlaqî ye, di nav me de biçûkahî û mezinahî şert e, berê hebû û şert e ku ji niha û pê ve jî hebe!!!

Civaka rêzan; ji ber ku civaka me, civakeke rêzan e, em neçar in ku qîmetê bidin kedê û ramana azad! Çimkî civaka rêzan, bi tevkariya hilanîn û danîna jiyanê, sazkirin û hilberîna debrê li ser lingan disekine. Lewma jî pêwîst e ku em qîmetê bidin kedê, lê qîmetdayîna kal- pîr û zarokan, lazim e ku ne li gorî esasên keda rojane bin. Ji ber ku kalpîr êdî nikarin bixebitin û zarok, hê ne bîrbirên xebatê ne qîmetdayîna wan, di civaka kevnar de li gorî esasên exlaqî bû û pêwîst e ku îro jî, sibê jî werê be!

Civaka şoreşger; di civaka şoreşger de lêpirsîn û darizandin, pîvaneke jêneger e, lê jin, ne li gorî hişê mêraniyê, li gorî hewcedariya çandî ya civaka exlaqî, rêzan û şoreşger tê darizandin û lêpirsînkirin.

Di civaka kevnar de mêvan dipeyivî, mazûbên guhdarî dikir, lê em dibînin ku di vê civaka me ya nûjen de bi piranî, mazûban dipeyive, mêvan guhdarî dike! Helbete li gorî pêdiviyê mazûban jî dê bipeyive, lê di asta nexweşiya peyvê de peyivîna mazûbên, çilvirîbûna çanda civakî ya exlaqî ye! Ferz e ku peyivîn, ne li gorî biçûk-mezin, jin-mêr, mêvên- mazûbên be, li gorî lazimiya ramana azad û li ser esasên exlaqî, rêzan û şareşgerî be!

Axir bi kinahî, ev sê xalên ku me li jorê, li pey hev rêz kirin, pîvanên çanda peyivînê yên civaka kurd ên kevn û nû yên lihevhatî ne! Heger ku ev her sê pîvan, di her devera jiyanê de, bi awayê hevxurtkirinê, ne bi hev re bin, civaka me dê çilvirî bibe; çilvirîbûna çanda peyvê ya civakê, têkçûna civakê ye û civakên ku bi awayê çandî têk herin, ew êdî êmê teyr û tebayan e!!!




## Mihrîcana Orkêş a Muzîkê bi dawî bû

Mîhrîcana Orkêş a Muzîkê ya 3yemîn a li bajarê Heseka kantona Cizîrê, bi beşdariya 24 komên stranan ên ji tevahî bajarên Herêma Bakur û Rohilatê Sûriyeyê û derve hat lidarxistin, bi dawî bû. Di çalakiyên roja dawî de koma "Gîvara- Kobanê, Koma Elefteriya ya Hîlala Zêrîn-Dêrik, Koma Mîrzo-Şengal, Koma Duret El Furat-Tebqa, Koma Gerstrêk a Hîlala Zêrîn-Hesekê, Koma Rojav-Dirbêsiyê û Koma Şehîd Zîlan huner û stranên xwe pêşkêş kirin. Piştre xelat li komên beşdar hatin belavkirin. ***HESEKÊ***

## Albûma dawî ya Awazê Çiya hat qedexekirin

Li Tirkiye û bakurê Kurdistanê qedexe û astengiyên li hemberî zimanê kurdî berdewam dikin. Saziya Agahîdayin û Ragihandinê (BTK) bi biryara 2025/8842an a qanûna 5651an a 8/Ayê albuma dawî ya Awazê Çiya Dara Jiyanê ku 15ê tebaxê derxistibû li Tirkiyeyê guhdarîkirina wê li ser spotifyê qedexe kir. Albuma Dara Jiyanê 15ê tebaxê derketibû û li ser rûpela YouTube ya Med Hunerê hatibû belavkirin. ***AMED***

## Alfabeya kurdî fêrî zarokan kirin

Xebatên Komeleya Lêkolîn û Pêşvebirina Çand, Huner û Zîmanê Kurdî ya Siwêregê (ZIWAN-KURD) berdewam in. Di çarçoveya xebatên ziman de, li navçeya Siwêrega Rihayê bi hevkariya Komeleya Lêkolînên Ziman û Çandê ya Mezopotamyayê (MEDDER) û Komelaya Ziman, Çand û Hunerê (ANKA-DER) ji bo zarokan çalakî hat lidarxistin. Li komeleyê, zarokan govend gerand û demên bicoş û peroş derbas kirin. Piştî gerandina govendê, mamostayan alfabeya kurdî fêrî zarokan kir. ***RIHA***

## Mihrîcana Fîlman a Duhokê dest pê kir

Mihrîcana Fîlman ya Navneteweyî ya Duhokê ya 12emîn dest pê kir. Di mihrîcanê de 110 fîlm ji 37 welatan tevlî bûne. Ji vana 45 fîlmên kurdî 65 jî biyanî ne. Her wiha di mihrîcanê de gelek derhêner û sînemager ên ji welatên ereb bigire heta Ewropa, Amerîka û Asyayê cihê xwe digirin. Naveroka fîlman zêdetirî xwe girîngî daye mijara birîbûn, hişkesalî û avhewayê. Li gel nîşandana fîlman wê gelek bernameyên cuda yên hûnerî û rewşenbîrî jî bên nîşandan. Mihrîcan dê 8 rojan bidome û 17ê kanûnê bi dawî bibe. ***DUHOK***

## Li Hannoverê 'Resîtala Neteweyî'

'Resîtala Neteweyî' ku wê 19ê kanûnê were lidarxistin, ew ê hunermendên ji çar parçeyên Kurdistanê bigihîne hev. Hunermend wê ji bo yekîtiya neteweyî stranên xwe bibêjin. Şeva ku wê li bajarê Kuppelsaalê bi navê 'Songs of Unitiy/Resîtala Neteweyî' were lidarxistin, hunermend Xêro Ebas, Yelda Ebasî, Mehmet Akbaş, Mehmet Atli, Azad Bedran, Çopî, Bermal Çem, Dodan, Bilind Îbrahîm, Şehrîbana Kurdî, Gulseven Medar û Hesen Şerîf wê derkevin ser dikê. Projeya orkestraya ku wê ji çar parçeyên Kurdistanê pêk were, 12 hunermendên kurd bigîhîne hev.

xwebûn

15 - 21 Kanûn 2025/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 313

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Talana li derdora Pira Dehderî û Baxçeyên Hewselê



Serdar Altan

Li Amedê Baxçeyên Hewselê û Pira Dehderî, nirxên dîrokî ne ku wek mîrate heta roja îro hatine. Ew bedewiyek dîrokê, hêviyên pêşerojê û jîngeha mirovahiyê ne. Baxçeyên Hewselê ku di lîsteya Mîrateya Cîhanî ya UNESCO'yê de cih digire, di bin xeteriyeke mezin de ye. Her wiha Pira Dehderî ku ev hezar sal in li ser piyan e, rastî muameleyeke hovane tê.

Îro ev pir, ji ber avahiyên li derdorê hatine çêkirin û rantxurên bêînsaf taybetmendiya xwe hêdî hêdî wenda dike. Tîcaretxaneyên ku li derdora pirê ava bûne, ne tenê dîrok û xwezayê talan dikin, her wiha li ser civakê ranteke bêhesab ferz dikin. Kesên ku diçin ji bo dîtina pirê an jî li ber çemê Dîcleyê dixwazin bêhna xwe vedin rastî fatûreyeke gelek biha tên. Ji bo bikaribî ji xweşiya vê xwezaya bêhempa sudê werbigirî divê tu butçeyeke mezin veqetînî. An jî kesên ku bi zahmetî debara xwe dikin ji vê xweşiya xweza û dîrokê bêpar dimînin.

Êdî hatiye asteke wisa ku mirov naxwaze biçe vî diyarê bedew. Gelek kesên ku berê dema xwe li vê deverê derbas dikirin, tu niha ji wan bibirsî bi mehan an jî salan e ku neçûne derdora Pira Dehderî. Mirov dikare bêje ku di nav gel de aciziyeke mezin heye ji ber vê mijarê.

**Talankeran dest bi êrîşê kir**

Ev demeke nîqaşên tund hene li ser vê meseleyê. Berî çend rojan kesên ku xwe weke esnafên li derdora pirê didan naskirin, daxuyaniyek çapemeniyê dan û bi awayekî dijminane êrîşê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û sazî û dezgehên sivîl kirin. Sedema vê êrîşê helbet tirsa jidestçûna ranta mezin bû.

Paşî hate fêmkirin ku şaredarî ev demek e xebatek dimeşîne da ku vê mîrateya mirovahiyê ji destê rantxuran derxe û careke din radestî gel bike. Berî demekî xebatek hatibû meşandin û dihat xwestin ku çayxane û restorantên vê deverê bi awayekî dilxweşî ji bo guhertin û parastina derdora pirê werin îknakirin. Lê belê rantxur û çete ketine dewrê pêşî li vê yekê girtin. Bi gef û rêbazên çetewarî ji bo rantê bidomînin ketin nav hewldanan. Herî dawî esnafên li wê deverê bi tevahî hatine birêxistinkirin û daxuyaniyek bi vî rengî hate dayîn.

Di daxuyaniyê de diyar bû ku armanca vê komê çi ye. Hedef, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û sazî û dezgehên hawirdorparêz bûn. Bi zimanekî wisa êrîş pêk hat ku mirov armanca van kesan baş fêm dike. Dixwestin ku ranta vê deverê ji destê xwe bernedin û talanê mezintir bikin.

Niha em hinekî din bi berfirehî li girîngiya derdora pirê û Baxçeyên Hewselê binêrin û ev dever ji bo çi divê bê parastin binirxînin.

**Ev hezar sal in li ser piyan e**

Pira Dehderî ku sala 1065an di serdema Merwaniyan de li ser çemê Dîcleyê hatiye çêkirin, gewherek e ku heta roja îro di xwezaya Amedê de maye. Pir ji hêla dîrokî ve kevnareke bêhempa ye. Her wiha bi mimarî û qayîmbûna xwe jî di nav bermahiyên dîrokî de cihek taybet ji bo xwe çêkiriye. Pira ku ji aliyê mîmar Ubeyd Kurê Yûsif ve di serdema Merwaniyan de li ser çemê Dîcleyê hatiye çêkirin, roja îro jî bi îhtîşama xwe li ser piyan e.

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê berî çend rojan li ser talan û ranta li derdora pirê nûçeyek weşand. Di nûçeyê de bi wêneyên ku ji Google Earthê hatine wergirtin, qirkirina ekolojîk a li dora pirê û derdora wê kurteber tê kirin.

**Bi destûra qeyûman**

Li gorî nûçeyê avahiyên li her du aliyên pirê, ku di heman demê de mircana dîmena xwezayî ya ku ji aliyê geliyê Dîcleyê û Baxçeyên Hewselê ve hatiye avakirin, di sala 2016'an de bi tayînkirina qeyûm li Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê dest pê kiriye. Di wêneyên ku ji Google Earthê hatine wergirtin de, tê dîtin ku di sala 2014'an de li derdora pirê ti avahî çênebûne, lê bi qeyûmên ku di sala 2016'an de hatine tayînkirin re, roj bi roj dîwarên beton bilind bûne.

**Pira Dehderî ya ku hezar sal in li ser piyan e, van salên dawî di bin xetereyek mezin de ye. Ji sala 2016'an û vir ve her sal li derdora pirê kargehek nû vedibe û bi awayekî talankerî ew dever tê zeftkirin. Ev tîcaretxaneyên hanê bi awayekî kaçaxî têne çêkirin û xweşiya derdora pirê û çemê Dîcleyê xera dikin. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê wêneyên ku ji Google Eartê yên di navbera salên 2016-2025'an de hatine wergirtin weşandin. Di wêneyan de talana li herêmê sal bi sal çiqas mezin bûye xûya dibe. Niha Pira Dehderî û Baxçeyên Hewselê li benda alikariyê û hewldanên parastinê ye**





**Qeraxê çem hatiye xerakirin**

Di lêkolînên zanistî de yên ku li herêma geliyê çemê Dîcleyê û Baxçeyên Hewselê hatine kirin de, derdora 607 cureyên nebatan û nêzî 635 cureyên ajalan hatine tesbîtkirin. Li vê herêmê ku stargeha zindewaran e, gelek cureyên wan di bin xetereya qedandinê de ne. Nemaze li derdora Pira Dehderî, moloz û kertolên ku li qeraxê çem hatine reşandin û dîwarên beton ên ku bilind dibin, faûnaya vê bihuşta sirûştî roj bi roj xera dikin.

**Çûk li welat nehiştin**

Her wiha di nûçeyê de tê destnîşankirin ku bi destûra karsaziyên ku ji aliyê qeyûmên ku li şaredariyên bajarê mezin û navçeyan hatine tayînkirin ve hatine dayîn, gera mirovan li herêmê zêde bûye û qirêjiya dengî gihîştiye asta ku nema tehemûla wê tê kirin. Bi hebûna eywanên dawetan di nav karsaziyên ser pirê de, fîşekên hewayî yên ku tên teqandin, rêyên derbasbûna 180 cureyên cuda yên çûkan ên ku li herêmê dijîn diguherînin û dibin sedema mirina çûkan jî.

**Texrîbata sal bi sal**

Dîsa tê gotin ku berevajî îdiaya xwediyên karsaziyan ku li herêmê darçandin heye, guhertina li herêmê ku her roj zêde dibe û sînorên xwe fireh dike, bi vî awayî di wêneyên Google Earthê de yên bi salan re xuya bûye. Şaredarî bi vê daxûyanî û nûçeyê, ew kesên ku digotin em xwedî û esnafên vê deverê ne, îdiaya wan pûç kir. Her wiha dide xuyakirin ku divê ev mîrateya mirovahiyê bi her awayî bê parastin.

**Dibe mijara Konseya Bajêr**

Li ser van nîqaşan û xetereya mezin Konseya Bajêr a Amedê li ser vê mijarê bi awayekî taybet dê bicive. Civîna ku di 10ê çileyê de wê pêk bê, dê parastina hawirdora Pira Dehderî were nîqaşkirin.

Li gorî nûçeya Ajansa Mezopotamyayê Lijneya Giştî ya Asayî ya Konseya Bajêr a Amedê ya 32yemîn, dê bi rojeva avaniyên bêdestûr û dagirkirinan ên di demên dawî de li bajêr zede bûne de bicive. Bi taybetî dê avahiyên bêplan ên li derdora Baxçeyên Hewselê û Pira Dehderî ya dîrokî ku zirarê didin tevna dîrokî ya bajêr, xala sereke ya civînê be.

Di daxuyaniyê de ku ji aliyê Konseya Bajêr a Amedê ve hat dayîn, dê Lijneya Giştî ya Asayî ji bo çareseriya pirsgirêkên ku rasterast bandorê li jiyana bajêr dikin zemîneke girîng ava bike. Tê payîn ku biryarên di lijneya giştî de bên wergirtin bi sazî û dezgehên têkildar û raya giştî re bên parvekirin.

**Warê mirovahiyê li benda parastinê ye**

Niha Pira Dehderî û Baxçeyên Hewselê li bendê ne ku xebatek ji bo parastina wan bê meşandin. Digel ewqas pirsgirêkan jî helbet çareserî dê hebin. Di serî de şaredarî û saziyên ekolojîst, tevahiya sazî û dezgehên demokratîk divê di nav hewldanan de bin.

Lê belê peywira herî mezin jî dikeve ser milê gel. Divê gel li mîrateyên xwe yên ku dîrok spartiye wan xwedî derkevin. Ji ber ku ev dever, ango Baxçeyên Hewselê û mîrateyên li derdora wê jî bo jiyana civakê deverên jêneger in. Ev jîngeha mirovahiyê cihekî pîroz e.

Lazim e herkes bi vê hişmendiyê tevbigere û li derdora vê pîroziyê bibe xelek, an jî dê talanker û rantxur vê jîngehê li mirovahiyê teng bikin. Ji bo ev derdorên hanê bi ser nekevin ji destê kî çi tê divê bike, herkes peywira xwe bîne cih. Em bawer in, warê me û welatê me wê hêj xweştir û geştir bibe.

